# ROJEV

7 Kanûn- Duşem 2009 E-mail: awelat2002@yahoo.com Buha: 50 Ykr Hejmar: 25


## Xweđîderketina li îradeyê dê bidome



Gelê kurd îro rabûye ser piyan. Azadiya xwe dixwaze. Tu hêz an hebûneke ku karibe azadbûna gelê kurd asteng bike tune ye. Gelê kurd bi rengekî azad îradeya xwe raxiste ber çavan û destnîşan kir ku ev îrade Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan e. Gelê kurd li Rêberê xwe xwedî derdikeve, azadiya wî mîna azadiya xwe dibîne û heta her cure zext û îşkenceya di nava sîstema Îmraliyê de bi dawî bibe dê di berxwedana xwe de tu tawîzan nede û tu hêz nikaribe wê asteng bike... *Cemîl BAYIK R.2*

# DEWLETÊ LI AMEDÊ XWÎN RIJAND




Gelê kurd li her derê çalakiyên xwe yên ji bo azadiyê ligel terora dewletê bi israr didomîne. Duh li Amedê piştî ku polîsan destûr neda meşa şermezarkirina ji bo şertên girankirina li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di navbera gel û polîsan de pevçûn derket. Di pevçûna ku polîsan bi awayekî hovane êrîş kir de welatiyê bi navê Aydin Erdemê (23) ji navçeya Mahsertê ya Mêrdînê bi guleya polîsan bi giranî birîndar bû û li nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest da. Piştî mudaxaleya polîsan çalakî li seranserî Amedê belav bû... *RÛPEL - 4*



Aydin Erdemê bi guleya tîmên taybet hatiye qetilkirin wekî şehîdê aştiyê hate îlankirin.

## Li her derê çalakî...



## Pevçûn veguherîn qada şer

Li Êlih, Sêrt, Qoser û Stenbolê jî polîsan êrîşî gel kir. Piştî mudaxaleya polîsan her der veguherî qada şer. Li hemberî terora dewletê gelê kurd bi keviran bersiv da û çalakiyên xwe didomîne...

ÇALAKÎ R4



## Li Mêrsînê jî polîsan êrîş kir

DTP'ê li Mêrsînê bi beşdarbûna 10 hezar kesan dijî pêkanînên Îmraliyê mîtîngek li dar xist. Di mîtîngê de hate xwestin ku Îmralî bê girtin. Piştî mîtîngê polîsan êrîşî girseya ku belav dibû kir.



## Li seranserî Ewropayê çalakî

Kurdistanî li Ewropayê jî çalakiyên xwe yên ji bo Ocalan didomînin. Li Awusturya, Almanya, Swisre, Yewnanistan, Ingilistan çalakiyên protestoyî li dar xistin û daxwaz kirin ku rewşa Ocalan bê başkirin...

ÇALAKÎ R5

## Ji bo kedkaran bang

*Komîteya* kedkaran a Koma Civakên Kurdistanê diyar kir ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li Îmraliyê di 'çala mirinê' de ye û ev pêkanîn di heman demê de komployeke li dijî kedkarên tirk û kurd e jî û bang li kedkaran kir ku dakevin qadan û li dijî îmhayê têbikoşin... ***RÛPEL - 5***

## Ciwan li ser kar in

*Li Stenbolê* û Rihayê ji aliyê Însiyatîfa Ciwanên Apoger ve 10 erebe hatin şewitandin. Însiyatîfê da zanîn ku dê çalakiyên wan bidomin. Li navçeyên Stenbolê yên wekî Alibeykoy, Bagcilar û Sultanbeyliyê jî 3 erebe hatin şewitandin. Li Pirsûsê erebeyên aîdî AKP'î û polîsan hatin şewitandin... ***RÛPEL - 5***

## Li Sêweregê bûn

*Komên* Çareseriya Demokratîk û Aştiyê ku bi banga Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ji Qendîl û Mexmûrê hatine Tirkiyeyê li navçeya Sêweregê ji aliyê bi hezaran kesî ve hatin pêşwazîkirin. Berdevkê komê Şerîf Gençdal got ku pirsgirêk bi diyalog û makezagoneke demokratîk çareser bibe.

# Emîne Ayna: Tu tişt êdî weke berê nabe


Hevseroka DTP'ê Emîne Ayna der barê girtina DTP'ê de diyar kir ku bi girtina DTP'ê re pêvajoya ku dê bidin destpêkirin naşibe pêvajoyên borî û dubare kir ku partiya wan bê girtin ew ê li meclisê nemînin



Hevseroka DTP'ê Emîne Ayna nîqaşên di demên dawî de ji hêla AKP'ê ve tên meşandin nirxandin û diyar kir ku AKP ji xwe re DTP'ê wekî hevrik dibîne. Ayna diyar kir ku hewldana demokratîk a ji bo çareseriyê hatiye destpêkirin bi dawî bûye û wiha got: "Lê tu tişt wekî berê nabe. Girtina DTP'ê wekî ya HEP, DEP û HADEP'ê nabe. Encamên vê yekê dê ji bo her kesî giran bin."... *RÛPEL - 5*

## Êrîşî avahiyên DTP'ê kirin

Avahiya DTP'a bajaroka Karakopru ya Rihayê ji aliyê kesên nasnameya wan nediyar ve rastî êrîş û hewldana şewatê hat. Li Çîgliya Îzmîrê jî êrîşî avahiya DTP'ê kirin. Her wiha li hemberî gelê kurd polîs û ulkucî bi hev re tevdigerin. Li navçeya Erdîşa Wanê polîsan kesên ku di meşa protestokirina şert û mercên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan de binçav kirin teslîmî ulkuciyan kirin. Ulkuciyan îşkence li çalakgeran kir... ***RÛPEL - 3***




### Gelê kurd daketiye kolanan



Şer daketiye kolanan û barê giran ketiye ser milên me. Herî zêde hûn ê zehmetiya van rojan bikişînin. Ji zext û zordariyê herî zêde hûn ê bibin xwedî par...

ADIL ZOZANÎ R5

### Pêvajoya hebûn û nebûnê



Em ji ku dest bi pirsgirêkê bikin? Kin û kurt, kurd di qonaxeke "hebûn û nebûnê" de ne. Dewleta tirk, bi AKP'ê, li gorî demê şerbet belav kir. Pêşî mezrebe li sidan da...

MEDENÎ FERHO R8

Rêgeh

CEMÎL BAYIK

## Gelê kurd dê xwedîderketina li îradeya xwe bidomîne

Rêber Apo cihê nû yê di nava sîstema Îmraliyê de ku lê tê hiştin mîna 'çala mirinê' binav kiribû. Li hemberî nerazîbûna gelê kurd a rewa û demokratîk weşandina wêneyên Îmraliyê ya ji aliyê Wezareta Dadê ve jî ev navlêkirin piştrast kir. Mîna di wêneyên hate weşandin de jî hate dîtin Rêber Apo di cihekî mîna çaleke bêbinî de tê hiştin.

Ev wêneyên ji aliyê Wezareta Dadê ve hatin weşandin de cihê ku Rêber Apo lê tê hiştin nîşanî gelê kurd û tevahiya raya giştî ya demokratîk da. Ev yek jî nîşan dide ka nerazîbûna ku li hember cihê Rêber Apo lê tê hiştin tê nîşandan çiqasî mafdar e.

Guhertine cihê Rêber Apo pêwîst e mîna bûyereke ji rêzê û mîna guhertina cihê girtiyekî neyê dîtin. Girtina ber çavan a Rêber Apo ya mîna girtiyekî û nirxandina cihguhertina wî dê şaştiyek be. Tevî vê rastiyê jî hin derdor dikarin bikevin nava helwesteke ku bûyera cihguhertinê ji rêzê bidin nîşandan û mîna bûyereke takekesî bigirin dest. Divê were destnîşan kirin ku ev çewtnîşandan e û hedefa wê jî ew e ku raya giştî li gorî vê yekê bandor bikin. Guftûgoyên têkildarî guhertina cihê Rêber Apo û girtina dest a nerazîbûna gelê kurd a mîna hewldaneke tenê li hemberî girankirina şert û mercên jiyana wî dê şaşiyeke mezin be. Rêber Apo jî di nirxandina der barê xwe û cihê nû yê lê hatiye bicihkirin de destnîşan dike ku heger bûyer wisa were nirxandin dê şaş be. Beriya niha jî me destnîşan kiribû ku nêzîkbûna li dijî Rêber Apo, nêzîkbûna li hemberî gelê kurd e. Tiştê ku cewherê pirsgirêkê ye ev rastî ye.

Dewleta tirk di şerê taybet-qirêj yê li hemberî gelê kurd dimeşînê de israr dike. Di rewşa heyî de rêbazên teniktir û xeteretir yê şerê taybet-qirêj tên meşandin. Rêber Apo ev yek mîna, 'Bi nîşandana mirinê, dayina qebûlkirin a tayê' nirxand û rawe kir ku ev yek jî mîna bijarka bi tenê ya li pêşiya gelê kurd tê destnîşankirin.

Dewleta tirk bi dijwarkirina vê polîtîkayê dixwaze encamê bidest bixe. Ji bo vê yekê jî her rêbaza ku tê hişê mirovan jî beyî dudiliyekê bikar tîne. Bêguman dê gelê kurd vê polîtiyaka dewleta tirk qebûl neke. Piştî bicihkirina Rêber Apo ya di 'çala mirinê' de nerazîbûna gelê kurd û hêrsa wî vê yekê îspat dike.

Niha gelê kurd li her cihê ku lê dimîne li Rêber Apo xwedî derdikeve û qadan tijî dike. Dema vê yekê dike jî her tiştî dide ber çavên xwe. Mirin, birîndarbûn, îşkence û zîndanê bi tu awayî nake pirsgirêk. Ev yek jî îspat dike ku di her şert û mercî de dê li Rêbertiya xwe xwedî derkeve û li gel cih bigire.

Xwedîderketina bi vî rengî ya gelê kurd tê wateya ku wî mîna takekes nabînin û wî mîna îradeya xwe dibînin. Gelê kurd bi vê nêzîkbûna xwe çawa gotibe, 'PKK gel e, gel li vir e', Rêber Apo jî mîna hebûna berbiçav a hebûna xwe, raperîna derketina holê ya raman û hestên xwe digire dest. Ev ne rastiyeke gelê kurd a îro derketiye holê ye. Gelê kurd bi dehên salan li qada vê rastiyê diqîre. Bi Newroza Amedê ya 2005'an ku li Amedê mîna demokrasiyeke rasterast derkete holê gelê kurd ev yek vekirî anîbû ziman.

Di her dem an rewşên ku têkildarî Rêber Apo de nirxandinek were kirin de pêwîst e ev yek li ber çavan were girtin. Heger ev yek li ber çavan neyê girtin û mîna kesayetek ji rêzê bigirin dest, di encamê de xwediyê vê nêzîkatiyê wê bikevin şaşiyeke mezin û encamên giran ên ku nikarin ji bin rabin.

Gelê kurd îro rabûye ser piyan. Azadiya xwe dixwaze. Tu hêz an hebûneke ku karibe azadbûna gelê kurd asteng bike tune ye. Lê belê gelê kurd bi rêbaza çareseriya demokratîk, bi qebûlkirina îradeya wî dixwaze xwe bigihîne azadiyê. Gelê kurd bi rengekî azad îradeya xwe raxiste ber çavan û destnîşan kir ku ev îrade Rêber Apo ye.

Di nava sîstema Îmraliyê de nêzîkbûn û helwesta li dijî Rêber Apo ji aliyê dewleta tirk ve were nîşandan, di vê wateyê de dê were nêzîkbûna li hemberî îradeya gelê kurd. Dewlet bi helwesta xwe ya niha îradeya gelê kurd qebûl nake. Nîşan dide ku di bin esaretê de hiştina îradeya gelê kurd de bi israr e. Gelê kurd jî li hemberî vê yekê li îradeya xwe xwedî derdikeve û ji bo parastina rûmeta xwe dê berxwedana xwe bidomîne.

Mijar ji zû ve ji mijara guhertina cihê Rêber Apo derbas bûye. Pirsgirêk a bi rêbaza çareseriya demokratîk çareserkirina pirsgirêka kurd û pirgirêka gelê kurd e, rakirina astengiyên li pêşiya rastiya ku Rêber Apo nûnerê îradeya gelê kurd e. Rêber Apo dixwaze ji bo çareseriya pirsgirêka kurd gavên samîmî werin avêtin. Ev yek ji tenê bi bêhtirîn nêzîkirina Rêper Apo ya ji bo azadiyê dikare pêk were. Ev ne tespît an destnîşankirineke ku têkiliya xwe bi takekesbûnê re heye. Ev rastî bi xwe ye.

Pirsgirêka Afrîkaya Başûr bi muxatabgirtina Nelson Mandela û Rêxistina Kongreya Neteweyî (ANC) ya di bin serokatiya wî de hate çareserkirin. Di çareseriya pirsgirêka Filîstînê de jî hevditin bi Rêxistina Rizgiraya Filîstînê (FKO) û liderê wê Yaser Arafat re pêk anîn. Her çiqasî ku ev rastî bin, rola Rêber Apo ya di çareseriya pirsgirêka kurd de jî ev qasî rast e.

Bi vê rastiyê ve girêdayî ye ku gelê kurd li Rêber Apo xwedî derdikeve, azadiya wî mîna azadiya xwe dibîne û heta her cure zext û işkenceya di nava sîstema Îmraliyê de bi dawî bibe dê di berxwedana xwe de tu tawîzan nede û tu hêz dê nikaribe wê asteng bike.

# Israra kurdan a ji bo azadiyê

**Ev êrîşên îro li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û li kurdan têne kirin dê tenê rika kurdan a ji bo têkoşîna azadiyê dijwartir û xurtir bike**

XELÎL DALKILIÇ



Hikûmeta AKP'ê û rayedarên dewleta tirk piştî tecrubeya ew qas salan xuya ye ku hê jî bi awayekî bêcidiyet li rastiya kurdan û çareseriya pirsgirêka kurd dinêrin. Azmûnên ku heta îro hate jiyandin diviyabû derseke dîrokî derxistiba holê.

Li ser rûyê cîhanê dewletên ku bêyî rûmetdayîn û nasnekirina rastiya gelan xwe organîzekiribûn, piştre mecbûr man yek bi yek ji gelên ku bêhurmetî li wan kiribûn, lêborîna xwe xwestin û her mafên wan ên civakî naskirin. Li ser rûyê erdê tu gelên ku rastiya wan a civakî, nasname û mafê xweîdarekirinê neyî naskirin nemaye. Xwedî dewlet nebin jî, piraniya gel û civakan îro mafê xwe yê sîyasî jî bikar tînin û di bin pergalên wek otonomî, federasyon, konfederasyon û hwd. de xwe bi xwe birêve dibin. Qedexekirina nasname û perwerdehiya bi zimanê zikmakî îro jî aliyê hemû mirovahiyê ve wek şermeke paşverûtiyê tê naskirin.

Di vê mijarê de rewş û nêzikbûna dewleta tirk şêweyekî awarte nîşan dide.

Bi têkoşîna gelê kurd, dewleta tirk êdî nikare înkarkirina rastiya kurdan bi şêweya red û tunekirinê berdewam bike. Dewlet bi şeweyekî nû; ne bi kurdekî xwedî vîn, bi afirandina kurdekî dewletê yê bêvîn û jikurdbûnê derketî, dîsa ji bo berdewamkirina heman înkarê di nava hewldanê de ye. AKP'ê jî ji ber karakterê xwe yê bêhestî, pragmatîst û tu car ji bo polîtîkayeke wisa partiya herî guncav e. Hikûmeta AKP'ê ji bo berdewamiya desthilatdariya xwe û emirdirêjkirina dewleta paşverû di nava her lîstik û dek û dolaban de ye.

AKP ji neh mehan vir ve bi navê vebûnê xwe wek sembola demokrasiyê û çareserkerê hemû pirsgirêkên li Tirkiyeyê diyar kir û li hundir û li derve gelek hengame û xirecir derxist. Bi rol parvekirinê ya bi arteş û partiyên muxalefetê yên paşverû re xwest rûyê xwe yê sextekar, înkarker û paşverû veşêre. Piştî desthilatdariya xwe ya 7 salî û hewldana qaşo vebûnê ya neh mehên dawî, AKP'ê jî wek hikûmetên berê gîhişt qonaxa tehdîtkirina kurdan, qaşo tasfiyekirina têkoşîna kurdan û bi heqaretane êrîşbirina ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ê ku ji 11 salan vir ve di destê dewletê de girtî ye...

Gelê kurd bi têkoşîn û israra xwe di aştiyeke bi rûmet de çawa rastiya dewleta tirk û hikûmetên berê aşkera kir; AKP û rêveberên wê yên tu car jî li hember înada kurdan a di aştî û azadiyê de, êdî nikarin durûtiya xwe û dijminahiya xwe ya li dijî rastî û vîna gelê kurd veşêrin. Tevgera Azadiyê ya Gelê Kurd her roj dide xuyakirin ku ji bo aştiyeke bi rûmet û çareseriyeke bi riyên aştiyane amade ye. Her wiha, Tevgera Azadiyê bi îlankirina pêvajoya bêçalaktiyê û bi şandina Komên Aştiyê jidilbûna xwe ya di çareseriyeke bi rûmet de gelek caran raxist ber çavan.

Li hember her gotinên rayedarên dewletê û saziyên sivîl ên têkîldarî çareseriyeke bi riyên aştiyane, Tevgera Azadiyê di heman demê de bersivên erênî anî zimên û gavên pratîkî avêt. Lê li hember van gavên aştiyane hikûmeta AKP'ê ya ku behsa 'vebûn' û çareseriyê dikir, dilşa nebû û berovajî her ku çû kete nava tirs û panîkê.

Hikûmeta AKP'ê bi her gotina 'vebûn'ê êrîşên xwe yên li dijî rêxistin, sazî û siyasetmedarên kurdan zêdetir kir. Li hember hewldan û gavên aştiyane yên kurdan hikûmet di hemû sozên xwe yên dabû gel û raya giştî de bawerîdayina xwe winda kir û ji gramê ket. Ji ber ku rastiya AKP'ê bi vî awayî aşkera bû, gramiya wê jî di nava raya giştî de roj bi roj dadikeve. Êdî AKP, rastiya xwe nikare veşêre û tu gotin û pratîkên cuda ji partî û hikûmetên berê nikare derxe holê. Ew bi xwe jî wek hikûmetên berê dijdemokrasî, înkarker, tuneker û li hemberî pirsgirêkên civakî yên li Tirkiyeyê bêvîn e. Ji ber vê yekê jî li hember daxwazên gel ên demokratîk êrîşkar e.

Ji ber ku li hemberî têkoşîna gelê kurd hemû boyaxa rûyê wê rijiya, hikûmet dixwaze heyfa xwe ji birêz Ocalan ê di 6 metrekareyê de girtî ye bistîne. Ev bi serê xwe polîtîkaya erzan a pergalên dîktatoriyê ye. Bi heqaret li kurdan û rêberê wan kirinê 'comerdî'ya xwe radixe ber çavan. Xwediyên dewleta ji demokrasiyê tiştek negirtiye çawa bi heqaretê heta îro xwestine vîna kurdan biperçiqînin û wan weke civakeke bêrûmet bikin û bibînin; AKP'ê jî di vê demê de dixwaze bi heman polîtîkaya erzan heqaretê li kurdan bike.

Lê tiştên ku rayedarên dewletê û nûnerên AKP'ê ji bîr dikin ew e ku, kurd ne ew kurdê stûxwar û belengaz ê berê ne; bi têkoşîneke li dijî hemû diktatoran û pergalên paşverû yên li Rojhilata Navîn û hêzên emperyalîst, serbilindî û rûmeta xwe parastine û diparêzin. Ne tifaqên wan ên qirêj ên navdewletî, ne êrîşên wan ên leşkerî, siyasî, aborî û çandî û ne heqaretên wan ên ku erzaniya wan radixe ber çavan, êdî nikare wan rizgar û serkeftî bike. Ev êrîşên îro li Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û li kurdan têne kirin, dê tenê rika kurdan a bi têkoşîna azadiyê û xwedîderketina rêber, nûner û saziyên wan tûjtir û zeximtir bike.

ROJEV

Zozan Basın Yayın Adına
İmtiyaz Sahibi: Eser UYANSIZ
Yazı işleri Müdürü: Mustafa AGGÜL

Yönetim Yeri: Diclekent Bulvarı Termil Apt. Kat:3 No: 9 Kayapınar / DİYARBAKIR
İdare Tel: 0 (412) 251 38 88
Yayın (Weşan)
Tel: 0 (412) 237 48 91
Fax: 0 (412) 237 48 89
Baskı(Çap):
Stenbol: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basın Yayın Tan. San. Tic. Ltd. Şti., Telsizler Mevki Beşyol mah. Akasya Sok. No:23/A Küçükçekmece / İSTANBUL Tel:0 (212) 580 63 81
Edene: Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtçılık, AŞ. İstiklal Mah. İstiklal Cad. No:44 Seyhan/ ADANA
Yaygın Süreli Yayındır

www.arsivakurd.org

# Provokasyona plankirî

**Çalakiyên şermezarkinê yên kurdan rastî êrîşên polîsan tên. Polîs di çalakiyan de provokasyonan derdixin. Li Erdîşê polîsan kesên hatine binçavkirin teslîmî ulkuciyan kirin. Ulkuciyan jî îşkence li wan kir**

Li navçeya Erdîşa Wanê polîsan kesên ku di meşa protestokirina şert û mercên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan de bin çav kirin teslîmî ulkucuyan kir. Ulkucuyan îşkence li çalakgeran kir.

Li Kurdistanê bi rojan e gel bi çalakiyên xwe girankirina tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan protesto dikin. Dewlet tehamulî çalakiyên gel nake û mudaxaleyî çalakiyan dike. Di van mudaxaleyan de polîs, bi ulkucu û cerdevanan re êrîşên lincê pêk tîne û dixwaze provokasyonan derxe.

Li Erdîşê roja pêncşemê gel bi meşekî şert û mercên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan protesto kir. Polîsan mudaxaleyî meşê kir. Derket holê ku polîs bi cerdevan û ulkucuyan re tevgeriyane.

**Hevdîtin pêk anîn**

Li gorî agahiyên ji şahidên bûyerê hatine girtin polîs beriya çalakiya gel bi cerdevan û ulkucuyan re hevdîtin pêk anî ye û di dema ku bûyer derkevin dê çawa tevbigerin ji wan re gotine. Polîsan îdia kirine ku hedefa gel xwecihiyên navçeyê, afgan û kirgizên ku li navçeyê dijîn e. Ji ber vê yekê jî xwestine ewbaldar bin. Li ser vê yekê ewil cerdevaneke kirgiz êrîşî gel kiriye. Piştre jî polîsan, bi koma ku ji cerdevan û ulukucuyan pêk tê êrîşî gel kir. Balkêş e ku koma ku êrîşî gel kir bi daran xwe amade kiribûn.

**Li ber qereqolê êrîş kirin**

Şahidên bûyeran diyar kirin ku dema bûyeran de polîs çûne taxên ku tirk, afgan û kirgiz lê dijîn anonsa "ji wan netirsin û hûn jî xwe biparêzin" kirine.

Şahidekî bûyerê wiha got: "Dema ku pevçûn derket polîsan bi koma ku li cem wan bû re êrîşî gel kir. Wekî ku polîsan dixwest di navbera kurd û tirkan de pevçûnê derxin.Tiştên li Erdîşê qewimîn pir wahîm bûn. Hewldaneke provokatîf hebû. Dîsa kesên ku ji aliyê polîsan ve hatin binçavkirin jî teslîmî koma ku ji 20-30 kesan pêk dihat kirin. Vê komê êrîşî kesên ku hatin binçavkirinkir. Li ber Emniyeta Erdîşê ev bûyer qewimî.wekî ku rastî lincê hatin. Piştre jî ew xistin hundirê emniyetê." WAN (ANF)




## Êrîşî avahiyên DTP'ê kirin

**AVAHIYA** DTP'a bajaroka Karakopru a Rihayê ji aliyê kesên nasnameya wan ne diyar ve rastî êrîş û hewldana şewatê hat. Li Çîgliyê jî êrîşî avahiya DTP'ê kirin.

Kesên nasnameya wan nediyar cam û deriyên avahiya Nûnertiya DTP'a bajaroka Karakopru ya Rihayê şikandin û hewl dan ku bi benzînê avahiyê bişewitînin. Piştî kesên camê avahiyê şikandin û agir berdan avahiyê di avahiyê de zirareke mezin dan avahiyê. Agirê bi avahiyê ket ji aliyê ekîbên îtfaiyê ve hate vemirandin. Piştî bûyerê rêveberên DTP'ê çûn cihê bûyerê û diyar kirin ku avahiya wan a bajaroka Karakopru ya li taxa Çankaya kîlometreyekê nêzî Qereqola Cendermeyan a Bajarokê ye, lê ligel vê yekê cenderme, 35 deqe şûnde çûne cihê bûyerê.

Serokê DTP'a Navçeya Navendî ya Rihayê Mithat Karadag, li DTP'a Karakopru yê daxuyaniyek da û êrîş bi avayekî tund şermezar kir. Karadag, diyar kir ku kesên agir berdane avahiyê dixwazin aloziyan derxin û meşa DTP'ê ya Rihayê tehamul nekirine. Karadag, destnîşan kir ku kesên aştî û demokrasiyê naxwazin, 2 meh berê Nûnertiya DTP'ê ya Yenîşehîrê niha jî Rêxistina Karakopru dane ber agir. Karadag, anî ziman ku ew ê têkoşîna xwe mezintir bikin û nayên lîstikên şerxwazan.

Li aliyê din avahiya DTP'a Navçeya Çîglî ya Îzmîrê jî ji aliyê kesên nasnameya wan nediyar ve rastî êrîşê bi molotof hat. Di êrîşa ku dema kes li avahiyê tunebû pêk hat de camê avahiyê hatin kişandin. Piştî êrîşê Seroka DTP'a Îzmîrê Mukaddes Kubîlay û rêveberên navçeyê çûn avahiyê. Hat hînbûn ku êrîşkaran di êrîşa avahiya DTP'ê de molotof avêtine Buroya Dogalgaz a Kontrola Kalite ya Êlîhiyan jî. RIHA / ÎZMÎR (DÎHA)

## Birîndar birin Wanê

Li navçeya Geverê ya Colemêrgê Faruk Dîrî ku di bûyerên piştî meşê de, ji aliyê êrîşa polîsan de bi giranî birîndar bû rakirin Wanê.

Li navçeya Geverê ya Colemêrgê ji bo şermezarkirina girankirina tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan mîtîng hate li darxistin. Polîsan piştî mîtîngê êrîşî gel kir.

Di êrîşa polîsan de welatiyê bi navê Nizam Kirkagaç birîndar bû. Piştre jî welatiyê bi navê Faruk Dîrî jî di êrîşa polîsan de birîndar bû. Dîrî ku bi giranî birîndar bû rakirin Nexweşxaneya Dewletê ya Geverê, piştre jî rakirin Wanê. Dermankirina Nizam Kirkagaç jî li Nexweşxaneya Dewletê ya Geverê didome. COLEMÊRG

## Polîsan milê welatiyekî şikand

Di çalakiyên li navçeya Cizîrê ya Şirnexê pêk hat de di nava 17 kesên hatibûn binçavkirin de polîsan milê kesekî şikand.

Li navçeya Cizîrê ya Şirnexê bi armanca şermezarkirina şert û mercên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan en Girtîgeha Îmraliyê çalakiyên protestokirinê hatibûn lidarxistin û di encama çalakiyan de 17 kes hatin binçavkirin.

Li gorî agahiyên li nexweşxaneyê hatine bidestxistin, welatiyê bi navê Mehmet Demîr di dema mudaxeleya polîsan de milê wî hat şikandin û ji bo ku gilî neke wî îkna dalbin.

17 kesên hatine binçavkirin navên wan ev in: Dogan Ekîcî (19), H.B. (16), Mustafa Ertaş (46), Naciye Baysal (22), Yilmaz Guven (23), S.Î. (16), H.T(17), Mehmet Demîr (24), Îzzet Ceylan (49), M. Îhsan Aygun (36), Saît Dayar (28), M.Sînan Dagli (50), Mahmut Urek (47), H.A (15), F.E. (18), Nezir Urek (49) û Ahmet Urek in. ŞIRNEX

## Li Şengalê serê zarokekî hate jêkirin

Ji 3 xwendekarên li navçeya Şengala Mûsilê di 4'ê kanûnê de winda bûbûn cenazeyê zarokê 15 salî Nasir Reşîd Qasim bi awayekî serjêkirî, hate dîtin.

Li navçeya Şengala ku kurdên êzîdî lê dijîn, xwendekarê bi navê Nasir Reşîd Qasim yê 15 salî çend roj berî niha ji bo çûna dibistanê ji malê derket. Her wiha di heman rojê de 2 xwendekarên din jî winda bûn. Piştî venageriyan mal, malbata û hemû gundî ketin nava tevgerê. Di encama lêgerînê de cesedê zarok ku 10 kêr lêxistibûn û serê wî jêkiribûn hate dîtin. Li gorî agahiyan heta niha kesên ku bûyer pêk anîne nediyar in û tu kesî negirtiye ser xwe. Di dema lêgerînê de du zarokên din ku ew jî xwendekar bûn winda bûne heya niha agahî ji wana nehatiye girtin. MÛSIL

## Girtiyê 60 salî terkî mirinê kirin

Girtiyê PKK'î Ziya Ergezen ê 60 salî ku li Girtîgeha Tîpa F a Hejmar 2 a Tekirdagê dimîne, ligel nexweşiyên xwe yên giran serbest nayê berdan.

Welatiyên bi navê Ziya Ergezer û kurê wî Mehmet Ergezer, di 8'ê cotmeha sala 2005'an de ji doza PKK'ê de hate girtin û şandin Girtîgeha Tîpa F a Hêjmar 2 a Tekirdagê. Di sala 2006'an de her yek rastî 10 sal ceza hatin. Bav û kur ji ber parêzerê wan tunebû îtiraza biryarê nekirin û dosya wan a biryarê hîn li darazê tê rawestandin. Ziya Ergezer ê ku berê nexweşiya mîdeyê û krîza dil derbas kiribû, li gel nexweşiya giran serbest nayê berdan. Kurê Ziya Ergezer Mehmet Ergezer ku ligel bavê xwe li girtîgehê dimîne, ji bo bavê xwe nameyek şand. Mehmet Ergezer, di nameya xwe de diyar kir ku bavê wî berê nexweş bû û piştî ket girtîgehê û şûnde nexweşiyên wî zêde bûn û li wî giran bûn.

**'Dermankirin êdî fêdeyê nakin'**

Ergezer, di nameya xwe de destnîşan kir ku bavê wî nexweşiyên tansiyon, gurçik, mîde, bronşît û nexweyiya rêviyane li ser wî heye û wiha got: "Bavê min niha nikare bi serê xwe pêdiviyên xwe bibîne. Çend roj berê nîvê şevê nexweşiya wî giran bû. Rakirin Nexweşxaneya Dewletê ya Tekîrdagê, lê dîsa fêda wê çênebû. Ji bo vê yekê me berê li Komîsyona Mafê Mirovan a Parlamentoyê da. Lê ji me re gotin 'Tiştê ku em bikin tune'. Divê bavê min serbest bê berdan." Ergezer, got ku ji ber gelek nexweşî li ser bavê wî hene hefteyê 2-3 caran derdikeve revîrê. Ergezer, da zanîn ku êdî pir zahmetiyê dikşîne û mercên girtîgehê wî pir pir dişe nava zoriyê. Ergezer, bibîrxist ku wî ji Meclîsê, Wezareta Dadê û Komeleya Mafên Mirovan re name şandiye, lê heta niha tu encam bi dest nexistiye.

Ergezer, ji bo serbestberdana bavê xwe bang li raya giştî û saziyên mafên mirovan kir û xwest li hemberî vê rewşa bavê wî têkevin nava hewildanan. Ergezer, anî ziman ku niha bavê wî avêtine hembêza mirinê û radestî mirinê hatiye kirin û roj bi roj dihile. Ergezer, bi gotina "Edaleta dereng were ne edalet e" nameya xwe bidawî kir. ENQERE

## Li Wanê 4 kes hatin girtin

Li Wanê ji 7 kesên di bûyerên şermezarkirina şert û mercên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan de hatin bincavkirin, piştî derxistin pêşberî dadgehê 4 kes ji wan hatin girtin.

Li Wanê 7 kesên di bûyerên şermezarkirina şert û mercên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan de hatibûn binçavkirin, piştî pirsiyariya wan a Midûriyeta Polîsan derxistin pêşberî dozgeriyê. Dozgeriyê piştî îfadeya 7 kesan girt, 3 kes serbest berdan, Harun Ozlu, Kenan Gur, Emîne Kiye û Şeref Aşkan bi daxwaza girtinê sewqî dadgehê kirin. Heyeta dadgehê jî piştî îfadeya 4 kesan girt, bi îdiaya "Propaganda rêxistina dijzanî kirine" biryara girtinê da û şandin Girtigeha Tîpa F a Wanê. Heyeta Dadgehê pûşiyê li dora sutiyê Harun Ozlu û Kenan Gur wekî delîlê sûc hesiband. 3 kesên serbest hatin berdan, diyar kirin ku di binçavan de rastî lêdanê hatine. Pirsiyariya 8 kesên ku hîn di binçavan de ne jî didome. WAN

## Nijadperestan êrîşî ciwanan kir

Xwendekarê bi navê Sedat Kula ku di dema çêkirina anketan de li Qada Gazîosmanpaşayê rastî êrîşa bi kêr ya nijadperestên tirk hat, diyar kir ku berî êrîşê polîs ji wan re gotiye, "Der barê we de gilî heye. Hûn anketa siyasî çêdikin" û piştre rastî êrîşa nijadperestan hatiye. Kula diyar kir ku êrîş pêşiyê hatibû plankirin.

Li Meydana Gazîosmanpaşayê dema ji bo şirketeke taybet anket çêdikirin, xwendekarên bi navê Burhan Ilgin û Sedat Kula rastî êrîşa nijadperestên tirk a bi kêr hatin. Di encama êrîşê de her du xwendekar jî bi giranî birîndar bibûn.

Burhan Ilgin piştî tedawiya li Nexweşxaneya Lêkolînê ya Okmeydaniyê ji nexweşxaneyê derket û xwendekarê Beşa Têkiliyên Navneteweyî yê Zaningeha Stenbolê Sedat Kula jî li Nexweşxaneya Lêkolînê ya Hasekiyê tedawiyê dibîne. Têkildarî mijarê Kula diyar kir ku dema anket çêkirine pêşiyê polîsek hatiye cem wan û ji wan re gotiye "Hûn li vir çi dikin. Derbarê we de gilî heye. Hûn anketa siyasî çê dikin" û piştre çûye. Kulla anî ziman ku çend seat piştre polîs cardin hatiye cem wan û vê carê telefona şirketa em jê re dixebitin xwest. Piştre ez jî hatim meydanê û li meydanê kesekê destê xwe danî ser milê min û pirsa "Setad tû yî?" kir. Ez çawa pişt xwe zivirîm, tekbîr anî û bi kêrê êrîş kir. Kula anî ziman ku ew kes berî niha li dibistanê dîtiye û kesek nijadperest e.



Kula diyar kir ku piştre komek li derdora 50 kesan êrîşî wî kirine û ev tişt gotin: "Bi awaye korganîzeyî êrîş kirin. Pêşiyê amadekarî kiribûn. Di dema êrîşê de heqaret dikirin û tekbîr dianîn. Dema min tedawî didît polîsan ji bo îfadeya min bigire ez 4 seatan li ser piyan hiştim. Xwestin bin binçav bikin lê ji ber li dijî derketina bijîşkan, ez hilnedam bin çavan. Tevahiya şevê li nexweşxaneyê rawestiyan." Kula diyar kir ku baweriya wî bi dadê nayê û ji ber vê yekê serî li tu dadgehan nade. STENBOL

www.arsivakurdi.org

# Her der zîvirî qada şer

NAVENDA NÛÇEYAN - AMED

Li Êlihê nêzî 10 hezar kes, bi armanca şert û mercên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan şermezar bike, dest bi meşê kir. Polîsan li kolanan ewlehiyek fireh girt. Li Sêrt û Stenbolê jî bi heman armancê meş hatin lidarxistin. Polîsan mudaxeleyî meşan kir û her der zivirî qada şer. Li Qoserê jî polîsan mudaxaleyî girseyê kir

Li Êlihê girseya ku ji nêzî 10 hezar kesî pêk dê, bi armanca şert û mercên Ocalan şermezar bikin dest bi meşê kirin. Girseya ligel parlementerên DTP'ê Ayla Akat Ata, Bengî Yildiz, Şaredar Nejdet Atalay û rêveberên DTP'ê jî di nav de ji nêzî 10 hezar kesî pêk dihat dirûşmên ji bo Ocalan berz kirin. Li ser Kolana Diyarbakir jî girse kom bûn. Ji ber ku polîsan destûr neda ku meş pêk bê, pevçûnan dest pê kir.

**Li Sêrtê êrîşa polîsan**

Girseya li ber avahiya DTP'ê ya Sêrtê li hev kom bûn, bi armanca şermezarkirina şert û mercên Ocalan, xwestin bimeşin. Girseya ku ji nêzî hezar kesî pêk dihat dirûşmên ji bo Ocalan berz kirin û dest bi meşê kir, rastî mudaxeleya polîsan hat. Polîsan bi bombeyên gazê êrîş bir ser girsê û girsê jî bi keviran bersiv da polîsan. Di pevçûna navbera polîs û girseyê de nêzî 20 kes hatin binçavkirin. Pevçûn, li nava taxên Çakmak, Algul û Dogan belav bûn.

**Sultangazî û Umraniye**

Li navçeyê Sultangaziya Stenbolê bi hezaran kes bi armanca şermezarkirina şert û mercên Ocalan dixwestin li ber DTP'a navçeyê bên cem hev rastî astengiya polîsan hatin. Polîsên avahiya DTP'ê dorpêç kirin, destûr nedan girse berhev bibe. Li ser vê yekê girse kom bi kom li taxan belav bû. Komên sirûdên kurdî gotin, sloganên, "PKK gel e gel li vir e", "Kurdistan dê ji faşîzmê re bibe goristan", "Dîsa dîsa serhildan Serokê me Ocalan" avêtin. Komên ku li taxan kom bûbûn dest bi çalakiyan kir û Sultangazî vegeriya qada şer.

Her wiha li Umraniyeyê jî meş û çalakî hebûn. Bi hezaran kes bi armanca şermezarkirina şert û mercên Ocalan li ber Marketa Bayram a li Esenşehîrê hatin cem hev. Koma sloganên, "PKK gel e gel li vir e", "Ji Îmraliyê re hezar silav", "Bijî Serok Apo" avêtin rastî mudahaleya polîsan hat. Li ser mudahaleya bi bombeyên çav sotinê û ava şidayî, girseyî jî bi keviran bersiv da. Di vê navberê de polîsan êrîşî rojnamegeran kir û dest danîn ser wêneyên wan.

**Li Qoserê jî heman dîmen**

Li navçeya Qoserê bi hezaran kes, bi armanca şert û mercên Ocalan şermezar bike li ber avahiya DTP'a Qoserê civîyan û xwestin bimeşin. Girseya dest bi meşê kirin rastî mudaxeleya polîsan hatin. Polîsên li kolana Rihayê bi bombeyên gazê û ava şit êrîş bir ser girseyê . Piştî êrîşa polîsan girseyê jî bi keviran bersîv da polîsan.

Li navçeya Silopiyê çalakiyên bi heman armancê çalakî pêk hatin. Çalakiyên li taxên Yenîşehîr û Nuhê dest pêkiribûn hîn didomin. Komên agir pêxist û ji bo Ocalan dirûşm berz kirin dest bi meşê kirin, rastî mudaxeleya polîsan hatin .Polîsan bi ava şidayî û bombeyên gazê êrîş li çalakvan kir û pêvçûn hej didomin. Hate zanîn ku heya niha 3 kes hatin binçavkirin.

Çalakî û meşên ji bo protestokirina girankirina şert û mercên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li Çewlîk, Wêranşar û Serê Kaniya Rihayê û li Artêmeta Wanê pêk hatin.






# Li Amedê terora Tayyîp Erdogan

## Hêzên dewleta tirk guhdariya serokwezîrê xwe kir û li Amedê ciwanê bi navê Aydin Erdem hate qetilkirin. Bi 10 hezaran amediyên ji bo şermezarkirina tecrîda li ser Rêberê xwe daketîn kolanan rastî terora dewletê hatin

Li Amedê, bi armanca şermezarkirina şert û mercên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ên Girtîgeha Îmraliyê û girtina doza DTP'ê, bi hezar kes li ber avahiya DTP'a Amedê kom bûn. Girseya ku xwest ber bi cadeya Dîrekxaneyê ve bimeşe rastî êrîşa polîsan hat. Di nava nîv saetê de pevçûn li tevahiya bajar belav bûn. Ciwanê bi navê Aydin Erdem (23) bi guleya polîsan hate qetilkirin. Gelek kes jî birîndar bûn. Hejmara kesên hatine binçavkirin nehate hîn bûn. Parlamentera DTP'ê ya Amedê Aysel Tugluk anî ziman ku polîsan meşvan tehrîk kirin.

Li Amedê bi armanca şermezarkirina şert û mercên Ocalan ên li Girtîgeha Îmraliyê bi hezaran kes li ber avahiya DTP'ê ya Amedê kom bûn. Girsê gelek posterên Ocalan û alên PKK'ê hilgirtin û pankarta "Tenê daxwaza me azadiya te ye" vekirin û dirûşm berzkirin.

Bi 10 hezaran kesên ku li ber avahiya DTP'ê civiyabû bi armanca şermezarkirina tecrîda li ser Ocalan dest bi meşê kir. Polîsan li ser cadeya Dîrekxaneyê li duryana sûka necaran rê li ber girseyê girt û hişt meş bidome. Ji ber ku di encama hevdîtinên rêberê DTP'ê midûrên polîsan de jî tiştek derneket, di navbera polîsan û girseyê de pevçûnan dest pê kir.



Aydin Erdemê 23 salî li Zanîngeha Dîcleyê Zankoya Matematîkê beşa mamostetiyê pola 3'emîn dixwend

**Ciwanek qetil kirin**

Di nava nîv saetê de li tevahiya bajarî pevçûnan dest pê kir. Di vê navberê gelek birîndar bûn. Li nêzî avahiya DTP'ê ciwanê bi navê Aydin Erdem bi guleya polîsan bi giranî hate birîndarkirin. Erdem, ji aliyê çalakgêran ve rakirin nexweşxaneyê. Erdem li nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest da. Hate hînbûn ku Aydin Erdemê 23 salî ji Mahseta (Omerlî) Mêrdînê, li Zanîngeha Dîcleyê xwendekarê beşa matetîkê, di pola 3'yemîn de xwendekar bû. Erdem yek ji serê xwe yek jî pişta xwe bi 2 guleyan hatibû birîndarkirin û piştî rakirine nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest da. Di pevçûnên ku heta derengî şevê li kolanên Baglarê û Suriçiyê dom kir de hejmara kesên hatine binçavkirin nayê zanîn. Parlamentera DTP'ê ya Amedê Aysel Tugluk anî ziman ku Amed careke din rastî terora dewletê hatiye. Tugluk got: 'Midûriyeta polîsan meşa gel provoke kir. Amed careke din rastî terora dewletê hat" Li Amedê, piştî polîsan mudaxaleyî girseya ji nêzî 10 hezaran pêk dihat kir, di navpera polîs û giresyê de pevçûn derket. Pevçûn li navçeyên Navendî yên Baglar û Peyasê belav bûn. Di pevçûnan de girseyê êrîş bir ser avahiyê AKP'a Amedê. **AMED**



# Li Şemzînanê polîsan zarok di pirê de avêtin

Li navçeya Şemzînanê Komên Çareseriya Demokratîk û Aştiyê, beşdarî civîna gel bûn. Piştî axaftinan girseya li hev civiyabûn dest bi meşê kirin û polîsan bi bombeyên gazê mudaxaleyî girseyê kir û pevçûn derket. Hate ragihandin ku polîsan zarokên binçav kiribûn di pirê de avêtin. Rojnameger ji pêkanîna polîsan a hovane re bûn şahid.

Endamên komê li ber avahiya DTP'ê ji aliyê hezar kesî ve hatin pêşwazîkirin. Bi sedan kesên ku ji gundan xwestin bên navçeyê jî li ser riyan ji aliyê leşkeriyê ve hatin rawestandin. Di pêşwazîkirinê de girseyê pankartên "Vîna gel di çala mirinê de hilnayê", "Çiya rûmeta me, kesên ji çiyê tên jî gurûra me ye" vekirin. Girseyê bênavber dirûşmên dilsoziya xwe ya bi Ocalan re dianîn ziman berz kirin.

Endama Komê Elîf Uludag jî diyar kir ku têkoşîna bi gelê kurd re dê ji niha û şûnde jî bidome. Uludag, bal kişand ser girankirina tecrîda ser Ocalan û wiha dom kir: "Birêz Ocalan her ku dibêje aştî tecrîda li ser wî girantir dikin. Lê gelê kurd vê yekê qebûl nakin. Dibêjin em qebûl nakin û derdikevin kolanan. Gelê kurd 30 sal in di ber vê dozê de belelên mezin dan û hîn jî didin. Divê hikûmeta Komara Tirk vê yekê baş zanibe."

Piştî axaftinan girseyê xwest bimeşe. Girseya ku posterên Ocalan vekirin û meşiyan rastî êrîşa polîsan a bi bombeyên gazê hatin. Girseyê jî bi keviran bersiv da polîsan. Di vê navberê de nûçegihanê DÎHA'yê Ubeydullah Hakan ragihand ku polîsan li pêşberî wan zarok di pirê de avêtine. **COLEMÊRG**

# Erdogan beriya ku biçe êrişî DTP'ê kir

**Erdogan beriya ku biçe Washingtonê û bi Barack Obama re hevdîtinê bike li Stanbolê daxuyanî da. Di daxuyaniyê de li cihê ku rojeva serdana xwe aşkera bike êrîş bir ser DTP'ê**

Serokwezîrê Tirkiyeyê Recep Tayîp Erdogan beriya ku bi rê keve û biçe serdana Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) li balafirgeha Ataturk a Stenbolê daxuyanî da. Di daxuyaniyê de êrîş bir ser DTP'ê û ji rojeva serdana xwe ya Washingtonê hin beş aşkera kirin.

Erdogan beriya ku bi rê bikeve bersiv da hin pirsên rojnamegeran.

Erdogan li ser pirsa roja 8'ê kanûnê danişîna doza girtina DTP'ê di Dadgeha Makeqanûna Tirkiyeyê de tê dîtin bertek nîşan da û bi rûyekî agresîf diyar kir ku 'hûn ji bo zaroka newelidiye derpê didûrin'. Erdogan diyar kir ku biryar Dadgeha Makeqanûnê dide û biryara ku bê dayîn ji bo welatê me pîroz be. Erdogan pirsa mafê vegera sîneyî-mîlet jî bersiveke dij demokrasiyê da û got ku biryareke wisa ne di destê hin partiyan de ye.

Li ser darizandina generalan û serbestberdana wan tu tişt negot. Xwest her kes destê xwe ji ser dadgehan bikişîne û bila dadgeh van biryaran bide.

Li ser pêvajoya geşedanên demokratîk jî pirs hat û bersivê de tiştekî matmayî pêşkêş kir. Erdogan li ser mijarê wiha got: "Di dawa kê de çi kevir hene bila rake erdê". Erdogan dema wisa got qe qala kevirên ku di dawa AKP'ê û baza wê û Serokdewletê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) Barack Obama de hene nekir.

Erdogan tenê destnîşan kir ku pêvajoya çareseriyên demokratîk projeyeke dewletê ye û muxatabê wê 72 milyon kes in. Erdogan bi vê helwesta xwe jî pêvajoya çareseriya demokratîk jî wisa geşedaneke bê berpirs û bêalî li holê hişt.

Serokdewletê Tirkiyeyê diyar kir ku piştî serdana Washingtonê dê îcabetê vexwendina fermî ya Serokwezîrê Meksîkayê Felîpe Calderon bike û roja 8 û 10'ê kanûnê de biçe Meksîkayê.

**Li bajarê kurdan şer**

Erdogan beriya ku biçe li hemû bajarên bakurê Kurdistanê şer hebû. Erdogan bê ku vê rewşa awarte li ber çav bigire dest bi ger û geşta Washingtonê kir. Di daxuyaniyê de qet qala vê nekir. Negot ku bi milyonan kes li ser piyan e.

Lê beriya ku biçe Amerîkayê ji Tirkiyeyê xwest ku ji bo şerê Afganistanê leşker bişîne. Erdogan ev jî bi çend gotinan pîne kir. Da zanîn ku ew leşker ne ji bo şer dişînin Afanistanê. Lê mijara bazara Tirkiye û Amerîkayê neanî rojevê û qala vê nekir. Gelek kes di vê baweriyê de ne ku Erdogan û Obama dê di vê hevdîtinê de li ser kurdan bazar bikin. Erdogan ji bo tasfiyeya PKK'ê ji Obama piştgiriya şênber bixwaze û Obama jî ji Erdogan bixwaze ku li herêmê li dijî Îranê piştgiriya wan bike. Ji bo şerê li dijî Talîbanê jî leşker bişîne Afganistanê. Lê di daxuyaniya Erdogan de jî derket holê ku bazara li dijî kurdan û partiya wê PKK'ê li pişt dîwaran bi awayekî tarî bi rê ve bê birin. AMED



## Di şerê Nepalê de 3 kes mirin

Li Nepalê di nav polîs û xwepêşandêrên xwecihî de şer qewimî û 3 kes hatin kuştin.

Der barê mijarê de Komîsyona Mafên Mirovan a Nepalê daxuyanî da. Di daxuyaniyê de hat gotin ku polîs li herêma Kailalî ya 640 kîlometra rojavayê paytexta Nepal Katmanduyê bi ser xwecihiyan de girt. Li ser vê di nav polîs û xwecihiyan de şer qewimî û 3 kes hatin kuştin. Xwecihî bê ku ji hikûmetê destûr bigirin di nav daristanê de dijî û wargehên xwe di nav daristanan lê dikin. Polîs ji bo ku xwecihiya nav daristanê qedexeye bi ser wan de digire û wargehên wan hildiweşîne.

Çavkaniyên herêmî destnîşan dikin ku hejmara kesên ku jiyana xwe ji dest dane 5 e. Komîsyonê bo ku hikûmet dest bi lêpirsînê bike bang li hikûmetê kir.

Gel ji bo kuştina van xwecihiyan dest bi protestoyê kir û wesayîtên dewletê dan ber agirî. Li herêmê alozî zêde dibe. KATMANDU



## Li Fîlîpînan rewşa awarte hat îlankirin

Li welatê Fîlîpînan ji sala 1986'an û vir de cara yekem rêveberiya awarte hat îlankirin

Serokdewleta Fîlîpînan Gloria Arroyo, li eyaleteke li grava Mindanao rêveberiya awarte îlan kir

Li Maguindanaoyê der barê hilbijartinan de 57 kes hatibûn kuştin.

Waliyê eyaletê Andal Ampatuan Sr û ji malbata wî gelek kes jî têkildarî mijarê hatin girtin.

Li welat, ji sala 1986'an ku dîktato Ferdinand Marcos ji rêveberiya hat derxistin û vir de cara yekem rêveberiya awarte hat îlankirin.

Midûrê Giştî yê Ewlehiyê Jesus Versoza û Serfermandar Victor Ibrado ji bo rêveberiya awarte diyar kirin ku di eyaletê de hin bûyerên şidetê qewimîne û hin kesên çekdar jî li kesan gef xwarine û ji ber vê jî ji bo çareseriyê rewşa awarte hatiye îlankirin.

Waliyê eyaletê li dijî girtina xwe nerazîbûn nîşan neda. Her wiha lawê walî Zald Ampatuan ku rêveberê herêma xweser a mislimanan e jî hat girtin.

Der barê şaredar Ampatuan de jî bi sûcdariya kuştina 25 kesan doz hate vekirin.

Hat diyarkirin ku ji malbata Ampatuan 3 kes jî têkildarî kuştinan tên gerîn.

Her wiha di demên borî de jî li Mafuindananoyê di konvoyeke hilbijartinê pêk hatibû û di encamê de 27 jê rojnamevan 57 kes miribûn.

Li gorî daxuyaniya polîsan, Andal Ampatuan Jr û 100 hevalên wî, bi çekên otomatîk êrîşê konvoya hilbijartinê ya reqîbê xwe kirin. LÎMA

## Ev jî demokrasiya tirk e

Dadgeha Makeqanûna Tirkiyeyê îmza avêt bin panûneke skandal. Dadgehê biryar da ku girtina rojnameyên kurd û muxalîf wek hewldaneke demokratîk destnîşan kir.

Dadgeha Mafên Mirovan ya Ewropayê (DMME) li ser biryarên rawestandina weşanan binpêkirina mafê weşanê ye û bi vî awayî jî weşangeran tê birîn û nikarin peywira xwe ya cemaweriya agahiyê pêk bînin. Ligel vê biryara DMME'yê Dadgeha Makeqanûna Tirkiyeyê girtina weşanan wek pêwîstiya 'demokrasiyê' destnîşan kir.

Dadgeha Makeqanûna Tirkiyeyê biryara li xwediyê weşanan cezayê pereyan bê birîn betal kir û dadgehê destnîşan kir ku hemû xalên li ser çap û weşanê yên di qanûnê de hene li gor qanûnên Dadgeha Makeqanûnê ye.

Di biryarê de tê gotin ku cezayê pereyê dema li xwediyê rojnameyê bê birîn de bi sedemê binpêkirina mafê kesayetî û ji ber vê yekê ceza li berpirsê nivîsê bê birîn.

**Birîna cezayê pereyan**

Di biryara skandal de tê gotin ku birîna cezayê peran ji bo ewlehiya yekparetiya dewlet û milet ferz e, ewlehiya mîlî ya tirk jî pêwîstiya xwe ya ji bo vê heye. Tişta herî balkêş ev e ku birîna cezayê pere û girtina rojnameyan ya ji bo xatirê yekparebûna dewlet û miletê tirk wek pêwîstiya demokrasiyê binav dike.

**Rawestandina weşanê**

Li ser bê ku bê darizandin girtina rojname, kovar û televizyonan jî diparêze û wiha pê de diçe: "Biryar di çarçoveya di ser çapemeniyê de propagandaya PKK'ê de neyê kirin tê girtin." Bi vî awayî beriya ku doz bê vekirin û darizandin pêk bê û ceza bê birîn demildest weşanên kurd 15 roj, mehek tên girtin. Piştî girtinê doz dest pê dike û ev jî wek mecbûriyeta 'demokrasiya' Tirkiyeyê tê destnîşankirin. ENQERE

## Çeteyên tirk hatin berdan

5 Tirkên endamên kontrayên antî kurd ku planên êrîş, tehdît û kuştina karsaz û karbidestên kurd û siyasetmedarên kurd amade kirine, li dadgehên Almanyalê tên dadgehkirin.

Tirkên ku bi hewldan û pêkanîna sûcên krîmînal ên wek ruşwet, tehdît, şopandin, çek, xesp kirine û di bin navê Milîsên Neteweyî yên Tirk li Ewropa xebatên kirêt û derqanûnî û kujerî meşandine, di hefteya derbasbûyî de, li dadgeha Eyaletê ya Kolnê hatin dadgehkirin.

Koma tirkên kontrayî, di bin navê şerê li dijî PKK'ê de, li dijî esnafên kurd xesp kirine, tehdît pêk anîne, şantaj kirine, mirov revandine û palanên êrîş û kujeriyê amade kirine.

**Piştgirên wan jî hene**

Polîsên Almanyayê ketine nav lêpirsîn û lêgerîna kesên li pey van mîlîsên paramîlîter yên faşîst.

5 girtiyên ku tê îdiakirin têkiliya wan bi JÎTEM û îstîxbarata Tirk (MÎT) re hene ev in: Ali Bodur (50), Dogan Yilmaz (42), Aydin Sakarya (43), Huseyîn Beştepe (39) û Dursun Diktaş (60) in...

Di hefteya derbasbûyî ya dadgehkirinê de îdianame hate xwendin û şahid jî hatin guhdarîkirin. Ji kontrayên Tirk Alî Bodur û Dogan Yilmaz, roja pêşî, mikur hatin ku ew endamê rêxistina milîsên faşîst ên antî kurd in û li dijî kurdan êrîş kirine.

Kontrayên tirk ku sûcên xwe mikur hatin, di sibata 2009'an de, hatibûn girtin. Lê piştre ji bilî Alî Bodur tev serbest hatin berdan. Piştî 9 mehan jî, Alî Bodur jî, roja çarşema borî serbest hate berdan.

Hemberî ku kontrayên faşîst ên tirk li ser sûc û bi dokumanên sûc hatin girtin, di lêpirsînê û dadgehê de sûcên xwe mikur hatin jî, serbest hatin berdan û serbest digerin.

**Têkiliya sefareta tirk jî heye**

Ji bilî ku di îdînameyê de têkiliya kontrayên faşîst bi sefaretxanê re tê destnîşankirin, rayedarên Almanyayê jî destnîşan kirin ku, têkiliya kontrayên faşîstên tirk bi riya endamê koma faşîstên kontrayî Aydin Sakarya, bi konsolsoxanê re têkildar in.

Heman rayedaran destnîşan kir ku Aydin Sakarya pismamê Muhsin Yazicioglu ye.

Hat zanîn ku rûniştina kontrayên faşîstên tirk a dadgehkirinê, dê di 8'ê kanûnê de pêk were. KOLN

## Îranê gef li Swîsreyê xwar

Wezîrê Karên Derve yê Îranê Naucehr Muttakî li hevpîşeyê xwe yê Swîsreyê geriya û jê xwest biryara qedexeyê ya minareyê nexin meriyetê. Muttakî di gefxwarinê de diyar kiriye ku heke biryar bikeve meriyetê berpirsê vê dê Swîsre be.

Li ser mijarê ajansa fermî ya Îranê IRNA'yê agahî da. Hat gotin ku Muttakî li Wezîrê Karên Derve yê Swîsreyê Mîchelîne Calmy-Rey bi telefonê giriyaye û xwestiye ku biryara referandumê ya 29'ê mijdarê nexin meriyetê. Li gor IRNA'yê Muttakî Calmy-Rey bo ku ev qanûn nekeve meriyetê hişyar kiriye. Mattakî destnîşan kiriye ku heke Swîsre vê biryara qedexeya minareyê bixe meriyetê dê ji ber biryarê jî berpirs were girtin. Her wiha di vê der barê de çi geşedanên neyînî biqewimin dê Swîsre berpirs were girtin.

Her wiha IRNA'yê da zanîn ku Wezareta Karên Derve ya Îrnanê di ser sefîrê Swîsreyê yê Tehranê de Swîsre protesto kirine.

**Hewldanên çareseriyê**

Wezîrê Karên Derve yê Swîsreyê Calmy-Rey di bersivê de diyar kiriye ku referandum bêyî daxwaza hikûmetê pêk hatiye û ji bo civak û mafê civaka misilman bê parastin çi pêwîst bike dê bikin. TEHRAN

www.arsivakurd.org



Medenî Ferho

medeniferho@hotmail.com

# Pêvajoya hebûn û nebûnê

Em ji ku dest bi pirsgirêkê bikin? Kin û kurt, kurd di qonaxeke "hebûn û nebûnê" de ne. Dewleta tirk, bi AKP'ê, li gorî demê şerbet bela kir. Pêşî mezrebe li sidan da… Piştre ol bi kar anî… Hebanka dilxweşan pif da… Piştre siyaseta bazirganî kire rojevê… Piştre dîplomasi û "zilliyet"… Li Ewropa dîplomasî bi kar anî, li Başûr (Kerkûkê) zilliyet… Li Şam û Baxdayê, bû Osmanî û misilman…

Di van pêvajoyan de, operasyon û demagojî, ji pratîkê ranekir. Bi operasyonên eskerî û polîsî re, terorîzekirina gelê kurd berdewam kir. Tecrîd û êrîşên li ser Serokê Tevgera Azadîxwaz a Gelê Kurd Abdullah Ocalan neda rawestandin. Ji bo van kiryaran, tevahiya organîzmayên fermî û ne fermî kirin nava têkoşîneke dijwar.

Yek ji van organîzma medya bû... Yek jî dezgehên stratejîk bûn...

Baş tê zanîn ku ji destpêka Mogolan heya bi Osmaniyan, şaristaniya wan bazirganiya dagirkerî ye. Di vê bazirganiyê de siyaset heye, zilliyet heye, dîplomasî heye. Pêşî dagir dikin, ji holê radikin û piştre dîplomasiyê bi kar tînin, di encamê de mafê zilliyetê derdikevê holê. Mafê zilliyetê jî, astengiyên cografîk ji holê radike.

Bêguman zor û zehmetiyên dîrokê hene. Lê înkar, dagirkerî û lîstik, bûne pîşeyê tirkan. Îro, di kiryara kujerî ya li dijî Serokê Tevgera Azadîxwaz a Gelê Kurd Abdullah Ocalan de, heman siyaset kirine pratîkê...

Di vê pêvajoya di bin navê "vekirinê" de, bi gavên "Qumrî"yan têne bi ser kurdan de.

Piştî cih guhertina Birêz Ocalan û hevdîtina Birêz Kişanak û Demîrtaş bi wezîrê karên dadgeriyê re; wezîrê tirk heyeta xwe şande Îmralî... Belê heyeta xwe... Ne gelê kurd, ne îrada gelê kurd ya li parlamenê û ne jî îradeya meşrû (saziyên civakî) ya demokratîk li ber çavan girt.

Wek berê, îro jî, tê xwestin ku pêşketin, guhertin û destketiyên gelê kurd frên bikin û di nava demê de, bi "gavên Qumrî" yan ji holê rakin.

Rastiya vê pêvajoyê û encam gavên "QUMRÎ" yên desthilatdariya AKP'ê: Rêber Apo di bin talûkeyeke mezin de ye. Di binê çala 5 metroyî de, bê hewatî, teslîmî 'mirina reş' kirine. Ev rengê ceza di sedsalên navîn de, cezayê "cizwît"ê bû. Tirk di avaniyeke modern de, di odeyeke "8 x karo" ferehî, "11 x karo" dirêjî, mahkumî "mirina reş" kirine. Heyeta burokrasiya nasyonalîst jî, dixwazê ku, bi odeya tenîsê ya fermandaran, bi odeya dersxanê ya nefer û efseran maskeyekê, ji vê kujeriyê re amade bike.

Girtîgeha Metrîsê, ji islahkirina terorîstan re, di 1980'yî de hate çêkirin. Pêşî 100 kesên ku ez jî di nav de bûm, birin Metrîsê. Li wir jî masa tenîsê, pirtûkxane, dersxane hebûn. Lê ji bo kê? Îtîrafkar, gardiyan û eskeran li wan odeyan seyran dikirin. Di nava 4 sal û nîvan de min nedît, ku yek girtî birin wan odeyan. Di nava 4 sal û nîvan de, di her serdanê de, di her çûna dadgehê de, têra me li me jî didan û em nehotî dikirin.

Îcar, heyeta nasyonalîst a wezîrê tirk, dixwaze kê bixapîne?

Haaa, ez bêjim, ji bo medya berdevkê siyaseta fermî, malzeme amade kirin. Rojnamevanên weke Mehmet Alî Bîrand û Ugur Dundar û hwd. Vê malzemeya heyeta burokratên nasyonalîst, baş bi kar tînin.

Serokwezîrê Tirk Erdogan ku, hêza xwe tevan li dijî kurdan bi kar tîne û bi gotina "Kurdên min" dixwaze car din, gelê kurd dîl bigire û kole bike, dijberiya xwe ya li dijî îradeya gelê kurd anî ziman. Êrîşî gelê kurd û êrîşî DTP'ê kir... Ji bo Birêz Abdullah Ocalan jî, gotina 'terorîst başi' bi kar anî. Erdogan, fermana kuştina zarok û jinan dide, gelê kurd dûçarî komkujiyên reş û spî dike, di nava bêşermiyeke hetikber de, şervan û têkoşerên azadî û mafên xwezahî, 'terorîst' îlan dike. Ev bêbextiya bêexlaq e...

Pêwist e kurd, dijminê xwe nas bikin û xwedî biryar bin. Pêwist e kurd, ne tenê xweşkirin û guhertina cihê Birêz Ocalan, bikin daxwaza serbest berdana wî bikin. Eger rast be ku gelê kurd dibêje, **Rêber Apo xeta me ya sor** e, **pêwist e daxwaza serbest berdana wî bikin**.

Wateya **xeta sor, klîmatê jiyanê ye**...

DTP'e, îradeya siyasî ya gelê kurd temsîl dike. Li dijî doza girtina DTP'ê, parlamenteran tevan sozek dan û ev soza xwe ji raya giştî re jî deklere kirin. Pêwîst e li pey soza xwe biçin. Îstîfa parlamenteran tevan dê darbeyek mezin li parlamenterîzma tirk bide.

Desthilatdariya AKP'ê, muxalefet û artêş jî di nav de, li dijî kurdan, li dijî Tevgera Azadiya Kurd, li dijî pîroziyên kurd, li dijî nirxên kurd, zimanekî derî exlaqî bi kar tînin. Tirk ne dijmineki bi rûmet û ciwamêr in. Bêbext, rûreş û bextreş in...

Desthilatdariya AKP'ê, bi vê kiryara li dijî Birêz Ocalan, çembera jiyana gelê kurd, çembera siyaseta kurd, kire tara bêjingê. Pêwist e gelê kurd, bi ciwan, jin û medya xwe ve, bi siyaset û rewşenbîrên xwe ve vê tara bêjingê biikînin.

Wezîrê karên dadgeriyê û heyeta nasyonalîst, bi fotoyan dixwazin ku şema kuştina reş erzan bikin, dijberî û têkoşîna li dijî siyasetên demagojîk, derew û nîq, pûç derbixin.

Ne dem û heyam, ne serpêhatiyên me, ne êş û azarên temenî ne, ne demsalên derbasbûyî ku bi xwîna kuştiyên bi destê kontrayên tirk, destûrê dide. Ev pêvajoya hebûn û nebûnê ye...

Ev pêvajo hebûn û nebûna serokê Tevgera Azadiya Kurd Abdullah Ocalan e...

Hebûn û nebûna îradeya gelê kurd e...



# Mirovên devşîrme ji rastiyan ditirsin

**Serkarên tirk ji bo têkbirina tevgera kurd û vîna gelê kurd, tim berê êrişê serkarî û sarokatiya serhildanan kiriye, bi qetilkirina wan gel bê rêberî hîştine û vîna wan şikandine, şikandina vîna gel, tê wateya têkbirina gel, ji wê divê tu kurd di vî warî de bêdeng nemîne**

FÊRGÎN MELÎK AYKOÇ

Mirovên xweînkarkirî, yan jî devşîrme di her rewşê de rastiya xwe û nijada xwe ya bingehîn vedişêrin. Bi her awayî dixebitin ku xwe wek asilzadeyên nasnameya nû nîşan bidin. Ji wê jî ew hê bawerhişktir in, tim xwedî li karekterên nijatperest yê nasnameya nû derdikevin, wek seyên li fermana xwediyê xwe dipên, ji fermana desthilatdarên nasnameya nû re amade ne. Bi giranî li gel partiyên nijadperest û kevneperest cih digirin, ku bikanin xwe kamufle bikin. Gava mirov bi baleke kûr li rûçikên endamên Alperan, Ulki Ocaklari, MHP, CHP û hwd. binêre, mirov bi hêsanî têdigihîje, ku piraniya wan bi hêla nijadê ve ne tirk in.

### Kesên devşîrme xizmetî nijadiyê dike

Xwediyên çapemeniya bi serkariya dewletê ve girêdayî jî, bi giranî devşîrme ne. Ew kesên devşîrme yên wek kole ji her xizmetî re amade wek rojnamewan bikartînin. Bi destên wan hîtabê mêjiyên mirovên li Tirkiyeyê dikin. Mirov tenê li awayê nûçedayîna wan binêre jî dikare vê rastiyê bibîne. Ev li Ewropayê jî wiha ye. Li Almanyayê di nava Neo-Naziyan de, bi sedan kesên bi paşnavên biyanî hene, ev li Fransa, Holanda û hîn li gelek welatên din jî wiha ne. Ev helwest ji xwezaya devşîrmebûyînê tê.

Ev derdor ji hemû tişt, çalakî, serhildanên nasnameya wan ya bingehîn tîne bira wan, yan jî rastiya wan derdixe pehnavê ditirsin. Lewma nijadperestên herî êrişkar ji nava van derdorên nijada xwe inkar dikin derdikevin.

### Kurd li nasnameya xwe xwedî derket

Rabûna kurdan ya bi heybet, xwedî li xwe û nasnameya xwe derketina kurdan herî zêde jî, van derdorên devşîrme ditirsîne. Lew re ev nasnameya wan ya rast ya inkarkirî tîne bîra wan. Gotina "maşiqê celatê xwe bûn" ji vê rastiyê tê.

Min di navbera salên 1966 – 1972'an de li Manîsayê xwend. Wê demê pêjerekî(aşçî) me hebû, temenê wî li ser heftêyî re bû. Wî tim digot: "Mirovên Egeyê ji sedî nod bi nijadê ve grêk in. Ew keçika porzer ya kevir di destan de jî dişibiya grêkan.

### Ên êrişî kurdan kirin devşîrmebûn

Yên li Bayramîçê êrişê kurdan kirin jî beşeke wan ji gelê niştecih grêk in, beşek jî mihacir in. Polês û dewlet herî rihet dikane van der û doran, van devşîrmeyan têke nava tevgerê, yan jî bi kar bîne.

Îtîrfkarên tên bikaranîn jî li ser vê bingehî ye. Pêlên berxwedanê, bi şeref û rûmet jiyan ew îxaneta wan wek sîleyek li rûyê wan dide, wan ji civakê dûr dixîne. Lewma jî maşeyên gelek baş in. Li ser bingehê heman prensîbê bûne dijminê gelê xwe.

### Faşizma CHP'ê xwe aşkere kir

Kesên wek Kiliçdaroglu yan jî yên di nava partiyên tirkan de jî, li ser vê bingehî bûnin xwediyê kariyerên baş(yan jî cehştiyeke baş), ew ji bav û kalikên xwe şerm dikin û ji wan re çêran jî dikin, dev ji kariyerê bernadin, jixwe hetanê ber qirikê di nava heriya genî de ne. Ji wê jî Kiliçdaroglu tenê dikane xwe li kêleka Onur Oymen û Denîz Baykal wek kesayetî û tişteki bihesibîne. Ev karekter jî, hinek ji polîtîk û tarîqata çepgirên tirkan û ji kemalîzma di mêjiyê wan de hatî mixkirinê, tê.

Divê êdî hemû dersimî di nava gelê xwe de cihê xwe bigirin. Bi vê helwesta xwe bersiva wan xwînxwaran bidin. Di vê demê de rojev wisa bi lez e, mirov nizane li ser kîjan pêkhatin û rûdanê binivîse. Dema mirov bi navber jî dinivîse hê dijwartir dibe.

### Li dijî tasfiyeyê têkoşîna gel

Serkarên tirk ji bo têkbirina tevgera kurd û vîna gelê kurd, tim berê êrişê serkari û sarokatiya serhildanan kiriye, bi qetilkirina wan gel bê rêberî hîştine û vîna wan şikandine, şikandina vîne gel, tê wateya têkbirina gel, ji wê divê tu kurd di vî warî de bêdeng nemîne. Bi vî mabestî ez berê her tiştî wê tecrît, êriş û êşkenceya li ser serokê gelê kurd bi hemû nefreta dil şermezar dikim.

Partiya Karkerên Kurdistan 31 salên dijwar lê bi rûmet û serkeftî li pey xwe hîşt. Tekoşîna gelê kurd ji tunebûnê anî ber şêmûga çareseriyê. Wê çaxê tu kesî navê gelê kurd nedizanî, lê îro gelê kurd gelekî serbilind û organîzekiriye. Bê PKK'ê dê ev nebûna. Ji wê salvegera wê di serî de li hemû şehîdan, Serokatî û reberiya wê, tekoşer û dilxwazên wê, li tevahiya gelê Kurdistanê pîroz be.

www.arsivakurd.org

# Ferho 'Çîroka Me' nivîsand

NAVENDA NÛÇEYAN - AMED

**Romana Medenî Ferho ya bi navê 'Çîroka Me', çîroka Kurdistanê û gundiyên Kurdistanê ye. Gundî li dijî zordestiya dewleta tirk, têkoşîna xwe, bi her cureyên jiyanê û sembolên civakî, dîrokî û nirxan berxwedana xwe didomînin**

Medenî Ferho, di romana xwe ya dawî de, têkoşîn û berxwedana gundekî girtiye destên xwe û zordestiya hêzên artêşa tirk, wek neynika tevahiya Kurdistanê û kuştinên kujerên wan ne diyar, di nava hunandina romanê de xilmet dike. Romana Ferho ji nav weşanên Do derdikeve.

Di romana 'Çîroka Me' de bûyer, piştî têkoşîna azadîxwaz a di bin pêşengiya PKK'ê de, dest pê dike û dewleta tirk sîstema cerdevaniyê dike pratîkê, dest pê dike. Hêzên artêşa tirk, zorê li gundiyan dikin ku rahêjin çekên dewletê. Gundî daxwaza dewletê red dikin..

Piştî ku gundî rahiştina çekên dewletê red dikin, bûyer jî dest pê dikin. Mîna her gundê Kurdistanê, li gundê Medenî Ferho jî, 2 axa hene û bendûberberiya birakujiyê heye. Lê piştî zordestiya hêzên artêşa tirk, ya li ser gundiyan, her du axa jî di nav de, tifaqa gundiyan dibe yek. Bend û berberî ji holê radibe. Di wê navberê de, gizîrê gund û mirovekî din, radijin çekên dewletê û li dijî gundiyan dest bi kiryaran dikin. Her du mirovên caş, ji aliyê gundiyan ve têne îzolekirin. Piranî zarok û jinên gund, dijberiyeke tund nîşan didin. Jiyanê li her du kesan û malbatên wan dikine tara bêjingê. Her du mirov jî, bi dijwarî diçine ser gundiyan û hêza dewletê bi lîstik, bi teşqeleyên derew û neweyiyan, yanî derewan, jiyana gundiyan dikine nava astengiyên dijwar. Giliyê her caşikan, dibine sedema êşkence, girtin û kuştinan. Gundî jî, li dijî vê helwesta kujerî ya cerdevan û hêzên artêşa tirk, berxwedaneke mezin nîşan didin.

**Leheng jineke kurd e**

Di romana Medenî Ferho de leheng, jineke kurd Sînem Xan e. Jineke degel, zirek e û zarokên xwe tev şandine zanîngehê. Gerîla di tevahiya romanê de notr e. Heye û nîn e. Ciwanên kurd, derketine serê çiyan û ciwanekî ji gund jî li zanîngehê dixwîne û têkildarê gerîla ye. Gizîrê gund ku rahiştiye çek jî, di demên berê de, bi gerîla re têkildar e û tenê ew ciwanê li Zanîngehê vê yekê dizane.

Gizîr ji bo ku têkiliya wî ya bi gerîla re neyê zanîn, giliyê ciwanê li zanîngehê dike û dibêje, îşev civanê gerîla li mala wan e… Fermandar Tayfun ku dijminê sûndxwarî yê gelê kurd e, û tîmê taybet e, diavêje ser mala ciwanê kurd û bira, xwişk, dayik û bavê wî tevan dikuje, xaniyê wan jî xera dike. Tevan jî wek terorîst didine xuyakirin.

Berî bûyera avêtina ser gund, Gizîr û hevalcaşê xwe, giliyê her du axan, Sinem Xan û Mêrê wê Têlî Riza dike. Têne girtin, lê di avêtina gerîla ya ser qereqolê de, axayek ji wan tê kuştin û Fermandar Tayfun jî, Têlî Riza, bi armanca kuştinê dibe û winda dike. Axayê din û Sînem Xan jî, bi saya dostekî Surayanî ji kuştinê tên xelaskirin. Bi saya berxwedana Sinem Xan û bavê xwe, li bajêr jî, berxwedan û têkoşîn dest pê dike.

Di dema girtina binçavan de, Fermandarê Qereqolê ku ew jî bi nifşê xwe kurd e, dixwaze ku Sinem Xan bîne rê û bi mêrê wê û bavê wê çekan bide erêkirin. Fermandarê qereqolê, di dibistana ekserî de, serpêhatî û bîranînên fermandarên li Kurdistanê kar kirine dixwîne û dibîne ku fermandaran tevan destnîşan kiriye ku 'stûna bingehîn ya gelê kurd jin e'. Eger jina kurd were safîkirin, gelê kurd jî tê safîkirin. Fermandarê qereqolê bi vê armancê dixwaze ku Sinem Xan razî bike. Lê dinêre ku Sinem Xan eflatûneke û pir şareza û degel e. Di bûyerên piştre jî, Fermandar dibîne ku Sînem Xan, li pêşiya girse ye û lehengiya têkoşînê dike.

Ferho, di vê romana xwe de, dilpenahî û aştîxwaziya gelê kurd bi mînakên balkêş dide û bi dek û dolaban êrîşî dijmin nake. Lewra di romanê de, Sinem Xan, Fermandarê Qereqolê, (ne Fermandar Tayfun, yê tîmên taybet) ji mirinê xelas dike. Fermandarê Qereqolê ku bi nifşê xwe kurd e, piştî vê bûyerê, dayik û xwîşkên xwe tîne bîra xwe û tê guhertin, lê careke din wek ekserî tirk karê xwe didomîne.

**Dîktatorî û burokrasî**

Romana Medenî Ferho, bûyerên piştî damezrandina Komara Tirkiyeyê û dema şerê duyemîn ê cîhanê û diktatoriya Ismet Inonu jî mînakan dide û helwesta burokrasî û dadgeriya nasyonalîst a dewleta tirk datîne ber çavan. Lewra, di demjiyana salên 1945 û 48'an de, mînaka Şanê Îsmet di nava hunandina romanê de dide.

Di bin pêşengiya Sînemxanê de, ciwanên gund, rêxistiniya xwe pêk tînin û ew bi xwe parastina gundê xwe, li dijî cerdevanên herêmê, li dijî tîmên taybet dikin. Gundî biryar didin ku dozên xwe, nakokiyên navbera xwe û gundiyên dora xwe nebin devê dergehên dewletê. Dewletê jibîr dikin û ew bi xwe jiyana xwe saz dikin.

Piştî kuştina malbata ciwanê kurd yê di zanîngehê de, gundî du kêlên şehîdan ava dikin, yekê li goristanê, yekê jî li ser cihê mala ku ji laiyê hêzên Artêşa Tirk ve hatiye xerakirin û ocaxa malbatê hatiye tefandin.



## 50'emîn salvegera Beşa Kurdî ya Zanîngeha Bexdayê

Beşa Kurdî ya Zanîngeha Bexdayê ku heta niha rastî gelek astengiyan hatiye, 50'emîn salvegera damezirandina xwe pîroz dike.

Di sala 1959'an de Beşa Zimanê Kurdî ya Fakulteya Perwerdeyê ya Îbin Ruşd ya Zanîngeha Bexdayê hate damezirandin. Beşa kurdî di dema ku digotin îdiakirin ku kurdî ne zimanekî û perwerde û zanist pê neyê kirin de, hate vekirin.

Zanîngeha Bexdayê 50 sal berî niha di meha kanûnê de di encama xebata çend mamostayên welatparêzên kurd de hate damezrandin. Heta niha gelek xwedekaran karîne li beşa zimanê kurdî bixwînin û pisporiya xwe di warê zimanê kurdî de bidest bixin. Munasebeta 50 saliya damezirandina Beşa Kurdî ya Zanîngeha Begdayê pîrozbahiyek pêk tê. Seroka Beşa Zimanê Kurdî Dr. Yusra Mihemed Ebdulla, diyar kir ku 50 sal di ser damezrandina beşa kurdî de derbas bûye. Gaveke mezin e. Ebdula diyar kir ku beşa kurdî yekemîn beşa zimanê kurdî ya li cîhanê ye. **BEXDA**



## Mîhrîcana Fîlmê Karkeran

Di navbera 10-13'ê kanûnê de Mîhrîcana Fîlmên Karkeran dê li Antakyayê pêk bê. Ji bo mîhrîcanê amadekarî hê jî didome. Îsal dê 4'emîn Mîhrîcana Fîlmên Karkeran bi dirûşma 'Em cîhaneke din dixwazin' li Antakyayê pêk bê. Ji bo amadekariyên mîhrîcanê Komîteya Amadekar civiya. Di komîteya amadekar de nûnerên HAMOK a Navneteweyî, TMMOB, Platforma KESK'ê, Halkevlerî û DÎSK cih digirin.

Di civînê de Serokê şaxa DÎSK'ê Mehmet Guleryuz axivî û got: "Di vî demî de li gelek welatan bi beşdarbûn û keda karkeran ve Mîhrîcana Fîlmên Karkeran tê organîzekirin.

Mîhrîcana Fîlmên Karkeran di meha kanûnê de li Japonyayê, di meha mijdarê de li Koreyê û li Latîn Amerîkayê jî her sal bajarekî pêk tê." Guleryuz diyar kir ku di çarçoveya mîhrîcana me de fîlm nakevin pêşbirkan û pêşangeha fîman jî bê bilet û bê pereye. Ev organîzasyon ji aliyê sendîkayan û rêxistinên sivîl ve tê amadekirin. Mîhrîcana Fîlmên Karkeran yekemîn mîhrîcana ku li 3 bajaran di haman demî de pêk tê û bi dawî dibe ye. Guleryuz diyar kir ku ev organîzasyona Mîhrîcana Fîlmên Karkeran dê li 15 bajaran bê pêşandan. **HATAY**

## Çîroka sembola berxwedanê

Piştî ku derhêner Emîr Teha der barê şehîd Leyla Qasim de fîlmeke dokûmentî çêkir û li çend bajarên Kurdistanê hate pêşkêşkirin, niha ev fîlm dê di Festîvala Londonê ya fîlman de beşdarî beşa kêbirkêya fîlmên dokûmentî bibe. Emîr Teha got: "Festîvala Londonê ya fîlman niha fîlmê min ê bi navê "Leyla Qasim: Sembolek ji bo Berxwedanê" wek fîlmeke dokûmentî wergirtiye. Her wiha festîvalê ez vexwendime. Fîlmê min qala qonaxên jiyana şehîd Leyla Qasim dike ku tê de çendîn kesî nêzî Qasim diaxivin, min serdana Necefê kir da ku wêneyê gora wî bigirim. Min li Xaneqînê jî wêneyê mala wê ya rûxayî girt û di fîlm de bi kar anî." *(Sinemakurd.com)*



Kakşar Oremar
kakshar_oremar@yahoo.de

## Qêrîn û banga 'Sosin'ê

Carna hinek staran biqasî romanekê bandora xwe li ser hisên mirovan çêdikin. Lê ne her romanek belkî romana ku behsa: mirovheziyê, jiyana mirovên hêja, dîrokeke windabûyî, azadîxwazî, vejiyandina hisên mirî, wijdanên razayî û mirî, şehîdên dozeke bi qasî hezar salan dirêj, şehîdên doza azadiyê... dike.

Hunera kurda ya kilambêjiyê tev şikayet, gilî, gazinde, êş û elem in. Çi di berhemên folklorîk da be an jî stranên siyasî de, em bi dengên dilşewat çîroka jiyana kurdan dibihîsin. Stranên weke; Ehmedê Mala Musa, Cembelî, Arix, Seydikê Min û bi sedan berhemên wiha dikarin bibin hêvênê romanên dîrokî.

Belkî di hunera netewên din de xalên wiha kêmtir bên dîtin, lê stranbêj, dengbêjên me bi hemû hisên xwe yên humanîstî li kêleka êş û elemên gelê xwe bûne. Qêrîn û nalînên wan kirine stran û weke berhem kirine malê dîrokê. Stranên ku bi derbasbûna hezaran salan re weke zêrê zer qet ji buhayê wan nayê xwarê. Şirove, rexne û analîza li ser hunera kurdî pir kêm e. Di nava gelên din de dema berhemeke hunerî ji hêla kes û saziyan ve tê çêkirin, bi dehan şirove tên kirin. Sewiya rewşenbîriya civakê wihaye ku bilind dibe û nifşên din hunereke profesyonel û dewlemendtir diafirînin. Mixabin em di medya me kurdan de tiştekî wiha pir kêm dibînin. Heyf ku rewşeke wiha hêşta jî di çapemeniya kurd de bi başî cîgir nebûye.

Sosin keçeke dengxweş e. Ji nifşê piştî Mizgîn, Zozan, Gulistan Perwer, Merziye Rezazî û Bêrîvanê ye. Keça çiyayên Colemêrgê ye. Dengê wê esîl û kurdî ye. Xwedî qirikeke bêasîmîlekirî û zimanê wê di edakirina peyvên kurdî de paqij û li gor fonetîka zimanê kurdî ye. Lê li rex tevaya vane taybetmendiyeke Sosinê ji min re pir balkêş e. Bûyerên civakê zû hisên wê dilivînin û ji hêla gel ve jî bi başî têne pêşwazîkirin. Yanî wek dibêjin: 'Gotina ji dilî tê, zû jî li ser dilan hêlîna xwe çêdike."

Sosin weke nîv şehîdekê bi rêbaz û doza şehîdên Kurdistanê ve pir girêdayî ye. Di albûma wê ya dawiyê de strana 'Rêka min dûr e' çîroka jiyan û qehremaniya çend gerîlayên canfîda weke rêzefilmekê radixe ber çavên me. Di straneke çend deqeyî de Sosin weke romannivîsekê serbihûriyeke rastîn a şehîdên doza me tîne ber çavên me. Sorgulên ku ketine kemîna faşîstên dagîrker; Mehmûd, Serhed, Bêrîtan, Dîcle, Hişyar û Berwar, destaneke din ya tijî fedakarî dikene malê dîroka azadîxwaz a Kurdistanê. Sosin bi hemû dengê xwe yê tijî helawet weke dayikekê ku dilbend û ezîztirîn kesên xwe ji dest dabin, dike qêrîn: "Oy oy oy heval, heval, dayê,dayê, bira, bira...." Ev hawarên Sosinê li ser tirba wan şehîdan pir watedar e. Ji bo naskirina dîrok û trajêdiya jiyana netewa bindest û azadîxwaz hema bes e ku mirov vê stranê guhdar bike.

Min zêdetir ji sed carî ev stran guhdar kiriye û her carê jî hêsir bêîrada min hatine xwarê. Ez bawerim bihîstina vê stranê rondikên çavên gelek kesan barandine. Ew hevalên Sosinê bûn û wê bi vê stranê wefadariya xwe ya ji çend şehîdên doza azadiyê re daye beyankirin. Karekî wiha wijdana mirovan rihet dike ku qenebe ji hezar deynan deynekî xwe daye. Çimkî çiqas li ser wesfa wan kesên ku jiyana xwe danîn ser panka destê xwe û pêşkêşî rizgariya axa welat kirin, bê gotin û nivîsandin dîsa jî kêm e. Sosin dibêje: Ew bûn hêviyên jînê, bûn evîn û ketin dilê me. Qêrîna Sosinê mirovên bêwijdan û heta miriyan jî ji xewê hişyar dike.

Sosincan: Hêvîdarim nav û dengê te jî mîna yê Nesrîn Şêrwan, Meryem Xan, Eyşe Şan, Zozan, Gulistan Perwer, şehîd Mizgîn, Gulbihar û şêrejin û keçên çeleng bikeve nava rûpelên dîroka hunera Kurdistanê. Xwezî û hesretên te bi awayekî daxwazên me ne jî.

www.arsivakurd.org

# Rêwîyên şad



ZÊYAV ÇIYA

Em herdu li ber deriyê bexteweriya xwe rawestiya bûn. Deriyê welatekî ku bûye du parçe. Na; çar parçe. Ez behsa kîjan parçeyî bikim, bi eynî serpêhatiyê re rû bi rû hatiye, lê di van salên dawiyê de, herî zêdetir şerê têkoşîna me li ser axa Başûr û bi taybet li Bakurê Kurdistanê bi giranî jiyaye. Vekirina deriyê Bakur û derbasbûna herêmên şerê giran, bi têkoşîna her gerîlayekî ve girêdayî ye. Bi têkoşîneke xurt gerîla yek dikare her rê û xebatê bi dest bixîne. Vê carê ez jî di nav gerîlayên ku li deriyê bakurê Kurdistanê dixistin hebûm. Deriyê ku xeyalê cîhaneke nû li mirov vedike. Dibe ku te dest avêtibe çembilê deriyê jiyana xwe ya dawî, lê ji bo gerîlayekî xwedî lêgerînê azadiyê ev tu carî ne astengiye. Lewra gerîlayên ku di vî deriyî re derbas bûne û dibin ji bo xwe deriyê bexteweriyê dinirxînin. Beriya niha kî û kî di van deriyan re derbas bûne, tenê ev rê şahidê vê yekê ne. Yên derbas bûne û ne vegeriyane hene, yê ku derbas bûne û vegeriyane û dîsa ji bo derbasbûneke nû amedehiya xwe dikin hene. Ya ku ez dixwazim bêjim her gerîlayekî li ser vê rêzika sînorê ku di navbera bakur û başûrê kurdistanê de dirêj bûye, di pêşbirka bexteweriya jiyana xwe de ne.

Dîsa ev dem û ev roj bûn, ev germ û havîn bû gava ku Xelîl Çiya xwe ji rêwîtiya seranserê bakurê welatê çiyan re amade kiribû. Di wê salê de, dijmin ne tenê bi têlên strî sînor pêça bûn, lê belê ji goştê leşker û teknîka giran jî seranserê sînorê welatê me ku di navbera Bakur û Başûr de rapêça bûn. Lê heyî hêêê ku tu hêz bikaribe li pêşiya armancê gerîlayên çavreş bisekine. Yên xwe fedayî armancê xwe bikin, yan wê biperçiqînin û derbas bikin. Ji xwe êdî gerîla bi van rêgezan nasnameya xwe ya şervantiya vî welatî mohr kirine. Xelîlê ku çavê xwe berdabû projeya belgeseleke sînema, cihekî girîng di nava vê rêwîtiyê de girtibû. Navê serkeftin û qezenca herî mezin ya jiyana xwe li vê projeya xwe kiribû. Yê Xelîl Çiya êdî ne sînor ne dijmin û ne jî heval, fermandar û dostên wî dikarî bûn wî rawestînin û gotina neçe pê bidin erê kirin. Her çiqas ji bo wî jî mîna her gerîlayekî encamê vê rêwîtiyê ne diyar bû jî, lê xwe mîna rêwiyekî şad bi nav kiribû. Raman û hestê xwe di asta mezinbûn û giraniya rêwîtiya xwe de amade û tijî kiribû.

Berî niha bi deh salan, Xelîl çiya di vê riyê re çûbû û hatibû. Xelîl di wê çaxê de, bi hozanê welatê çiya, Serhed re di yek derî re ji başûrê Kurdistanê derbasî bakurê Kurdistanê herêma Botanê bûbû. Kamêrvanê çiya Xelîl û hozanê çiya Serhed, li ser projeyekê li hev dikin. Di armancê projeya van herdû hunermendan de ev hebû; wê gerîla Serhed bi têlê saza xwe ya birîn û şahiyê di dilê gerîlayê Botanê fetih bike, û gerîla Xelîl jî wê bi objektîfa kameraya xwe rû û dengê gerîlayên Botanê ji dîrokê re mîras hiştibana. Di wê demê de Botan deriyê riya Bakur ji herdû mêvanê xwe yê hunermend re li ser piştê vedike û bixêrhatineke germî ku liyaqî wane tênê pêşwazîkirin.

Botana ku zû eşqa xwe dixîne dilê her gerîlayekî de, wisa zû dilê gerîla Xelîl û Serhed jî qezenc dike. Bi xweza xwe ya çavên mirovan miç dike, hevaltî, birçîbûn, parvekirin, rexnekirin, avakirin, girî, şahî, evîn, veqetîn

Botana ku zû eşqa xwe dixîne dilê her gerîlayekî de, wisa zû dilê gerîla Xelîl û Serhed jî qezenc dike. Bi xweza xwe ya çavên mirovan miç dike, hevaltî, zorahî, dostayî, birçîbûn, parvekirin, rexnekirin, avakirin, girî, şahî, evîn, veqetîn. Ji her rêbazê ku jiyanê bi wate dike bi awayekî tazî xwe bi wan dide jiyîn û wan mezin dike.

Dibêjin ya; encama her afirandinekê ked e. Ya herî xweş jî ku tu bi xwe jî dibî şahidê vê rastiyê ye. Lewra pariyek nan û qurtek av ji bo ku tu bi vê jiyanê re bijî têra te dike. Serhed bi têlê dengê xwe yê çiyayî Xelîl jî bi kamêra xwe ku tu carî ji dest nediket, xwe newqî nava jiyana Botanê dikin. Serhed li her derekê bi konseran kêliyên hestiyar û bi coş bi gerîlayên Botanê dide jiyandin Xelîl jî ji bo ku van kêliyên xweşik bi dest bixe bûbû gerokê nava rû û hestan de. Ev herdû gerîla, ev herdû hunermend, ne tenê bi kar çûbûne Botanê, piştî ku karê xwe biqedînin wê li cihê ku jê hatine vegerin. Na; Xelîl û Serhed êdî mîna du botaniyan tev digeriyan û êdî di şevên ku bi rengên zimrudî diman wêneyê xeyalên hestiyar digirtin, Xelîl û Serhed bûbûn parsekê cîhana wan gerîlayê ku ew bi sala bû niştecihê herêma welatê ne nase bû. Li keştiya bîranînên wanî rabirdû siwar dihatin û xwe ber bi rojên wanî îro diherikandin. Dirêj dirêj Xelîl û Serhed xwe ji xewên şevan vedidizîn da ku tenê li lehengiya wan di qadê şer de guhdarî bikin, yan jî serpêhatî û bûyerê wanî jiyanî, bîranîn komîk û xemgîn, destanê evînên bi diziyî ku bi koçê abidîn rû bi rû hatibû guhdarî dikirin. Her diçû her dû hunermendan têra xwe ya nav Botanê berfireh dikirin û gerîlayek li ku bûna pêwîst bû xwe bigihandibanê. Yek yan deh gerîla ji bo wan ferq nedikir, ye girîng ew bû ku di ser kesekî de ne buhurin, ji ber ku herdû hunermendan jî dizanî bûn her tiştekî ji Botanê û gerîlayên botanî qezenc bikin wê bibe serwet û mîrasa hunera wayî ku wê rojekê ev dîrok wan pê xelat bike.

Ne girîng e her projeyek ku tu pê rabe heya serî biçe, yan jî ne girîng e ku tu her tiştekî dixwaze bi dest bixîne, belkî ne pir girîng e ku jiyana te têra rêwîtiyekî bi plan û xebateke bi aste ku te daye pêşiya xwe jî bike, lê ya girîng ew e ku berî her tiştekî ku tu pê rabe, tu bi serkeftin û qezenca wê bawer bike. Lê ya ku li vir qezenc kiriye tiştê ku em pê radibin. Mirin tu carî nakeve nav hesabê bawerî û serkeftinên ku em dixazin gavê wan bavêjin.

Gerîla Xelîl; şehadeta hozanê xwe Serhed mîna bûyereke herî bi birîn di jiyana xwe de dinirxand. Ne li bendê bû,



ne texmîn kiribû, ne jî jê re amade bû. Çawa dibe ku cêwiyê riya xwe ya Bakur winda bike û ew di şûn de bimîne û li dû wî jiyan bike. Çawa dibe ku cêwiyê hunermendiya xwe winda bike û çawa dibe ku cêwiyê deftara xwe ya sor ku bi hev re li ser rojaneyên xwe yên Botanê dinivîsandin winda bike. Ne misogere ku Xelîl vê koça Serhed ya bi tenê bipejirîne. Çima zorî nedabû Serhed da ku ew li pêşiya wî bireve. Çima gava ku Serhed ji helikoptera ku dijmin ew jê avêtiye hembêza xwe ji fira wî re venekiriye û beyî ku tiştek jê were ew nedaye ber hembêza xwe. Ne ev tenê; bi biryara Rêber APO ya sala 1999'an de, ku gerek gerîla xwe ji sînorê Bakur vekişîne, bi fermana rêxistinê, Xelîl neçarî vegera başûrê Kurdistanê dibe û di deriyê ku bi Serhed re derbasî bakurê Kurdistanê dibe, bi tena xwe têre vedigere.

Çûyîn xweş e; yan di şûn de mayin: gava ku em her dû li ser rêzika sînorê Bakurê kurdistanê li bende vebûna deriyê bexteweriya xwe bûn, mamoste û derhênerê min dubare dubare, ev gotin ji min re digotin. Ji xwe ji bo gerîlayekî ev pirs ne xaçepirs e, ne jî ji bo bersiv dayina wê pêwîstî bi şareza bûnê heye. Gava ku çavê min bersiva pirsa wî dida digot: Ji bo vê yekê pêwîst e ez biçim û divê kes ji min re ne bêje neçe. Gava ez li te dimeyizênim şehîd Serhed li bîra min tê. Hin tiştê te dişibin wî. Ne ji bo vê yekê tenê, piştî şehadeta Sarya û Serhed, ez ê careke din bi hevalên xwe yê xebatê re bi tu riyeke din ve neçim. Her car ez li dû wan dimînim û ez wan winda dikim. Lewra ez ê bi tena xwe bi vê riyê de biçim.

Berî vê bi deh sala di rojên tîrmehê ya germ de hozan Serhed şehîd ketibû. Berî sê salan ji niha di heman rojan de gerîla û hunermend Xelîl jî di eynî deriyê ku bi Serhed re derbas bûbû dîsa derbas dibe. Lê vê carê bi tena xwe bû. Min jî ji piş deriyê xwe yê girtî, li wê riya wî ku ji min ve dixuya û hêdî hêdî dûr diket û winda dibû temaşe dikir.

Ez dizanim êdî gerîla Xelîl careke din hozan Serhed bi tenê nahêle û ji Botanê venagere, lê deriyê ku Xelîl tê re derbas bûye, li dû xwe negirtiye. Ez bi vê hêviyê dijîm ku wê rojekê deriyê bexteweriyê ku herdû mamoste û hunermendê me tê re derbas bûne di rûyê min de jî vebe û ez ê jî tê re derbas bibim. Çima ez ê timaya navê rêwiya şad nekim ku jiyaneke xweşik li benda min be. Ez wesiyata vî deriyî li we jî dikim, hûnê poşman nebin.

# Çiya

*Gava çiya biaxivin,*
*Bi kevir û dar*
*Û kaniyan xwe ve,*
*Ka çend govend û dîlan*
*Ew jê re bûne şahid.*

*Gava çiya bêjin*
*Çîroka xwe,*
*Wê çend rûpel*
*Bêne dagirtin;*
*Her rûpelek, kirinek, çîrokek,*
*Berxwedanek, serpêhatiyek*
*Her rêzeke, berbangek*
*Û şer û cengek.*
*Her gotinek navê lehengekî,*
*Her tîpek*
*Lêdana dilê mirovkî.*

*Gava çiya dilê xwe vekin,*
*Rastiya xwe bêjin,*
*Ka çiqasî tî bûbû0*
*Û ava jiyanê dixwestin?*
*Zinar û lat jî*
*Bila biaxivin,*
*Ka çiqasî sor bûbûn,*
*Ji xwîna azadîxwazan.*
*Belê îro*
*Deşt jî bûne çiya,*
*Bajar jî bûne çiya,*
*Zindanên me jî bûne çiya.*

H. SAWÎŞ

# Were min bi tenê nehêle

*Were min bi tenê nehêle*
*Ji tenêtiyê hez nakim*
*Tenêhî*
*Tirsê*
*Xemgîniyê*
*Û dilêşiyê bi xwe re tîne*

*Were min bi tenê nehêle heval!*
*Navê tenêtiyê yê din mirin e*
*Were*
*Were ez naxwazim bimirim*
*Dixwazim bijîm ta ku jiyan hebe*
*Lê ne bi tenê*
*Bi te re*
*Bi wan re*
*Bi wî re*
*Û bi çiyan re*

*Were min bi tenê nehêle heval!*
*Jiyana bi tenê*
*Mîna kulîlka li ber beroşkan e*
*Ma ez ê çawa bijîm bi tenê?*
*Ma qey ez Eyûb im?*
*Ma Yûnis im?*
*Ma mirovê pîroz im*
*Ku bi tenê bijîm heval?*
*Were*

*Were min bi tenê nehêle*
*Were*
*Were bila jiyan bi te re bi tam be*
*Bila gul bi te re bixemile*
*Bila kulîlk bi te re bêhn bide*
*Bila av bi te re biherike*
*Bila bayê baniyan bi te re*
*bireqise*
*Erê heval*
*Bila roniya heyvê*
*Bi meşa te re*
*Ronî bike vê riyê*
*De were*

*Were min bi tenê nehêle heval!*
*Ku ez mirim*
*Min bi ava baranê bişon*
*Qewdek gulên sor*
*Û kulmek ji berfa Agirî*
*Têxin paşila min*
*Min bi cilan veşêrin*
*Kefen li min nekin*
*Li pala gund*
*Li pêşberî malan min veşêrin*
*Berf ê bihele*
*Gul ê di gora min de şîn werin*
*Dema welat rizgar bû*
*Min pê bihesînin*
*Da ku ez jî bi we re werim*
*Dîlana azadiyê*

GIRTIYEKÎ AZADIYÊ

ROJEV
7 Kanûn 2009 Hejmar: 25 Sal: 1 E-mail: awelat2002@yahoo.com



# Çaya nebatî ji bo her derdî derman e



# Nexweşiya pidiyan zirarê dide diranan

Nexweşiya pidiyan ku ji aliyê gelek kesî ve tê paşguhkirin, rê li xeterên mezin vedike. Nexweşiya ku tedawiya wê pir hêsan e, eger ku zû bê tedawîkirin, demildest rehet dibe. Lewra divê salê du caran ji aliyê doktor ve bê kontrolkirin

Nexweşiya perîodontal kêmgirtina pidiyan û raçinkê der û dora diranan e. Ji sedî heftê diranên mirovên ku emrê wan ji çilî jortir e hatine kaşkirin, bi sedema nexweşiya pidiyane (perîodontal) e. Dema nexweşiya pidiyan dest pê dike tedawiya wê pir rehet e.

Lê nexweşî pêşve çûbe tedawî hem zehmet e hem jî dom dike. Ji ber vê yekê salê du caran divê mirov here cem doktor muayene bibe ku bi vî awayî pêşî li nexweşiyê bigire.

Nexweşiya pidiyan dema ewil bi kêmgirtinê (gîngîvîtîs) dest pê dike. Pêşî li gîngîvîtîsê neyê girtin nexweşî wê pêşve here.



**Nexweşî belav dibe**

Lewra nexweşî tenê di pidiyan de nasekine, li hemû dev û raçinkê der û dora diranan jî belav dibe (Perîodontîtîs). Ev nexweşî xesarê dide çena mirov jî. Tenê di devê mirov de jî nasekine, di temamê laşê mirov de belav dibe. Divê mirov di dema gîngîvîtîsê de pêşî li nexweşiyê bigire û tedawî bike.

Nexweşiya diranan ku gelek girîng e ji aliyê hin kesan ve tê paşguhkirin. Nexweşiya pidiyan çawan e? Mirov bi çi awayî zane pidiyên mirov nexweş e? Der barê vê nexwşiyê de nîşane zêde ne.

***Doktor van nîşaneyan wiha rêz dike;***

- Dema mirov diranê xwe firçe bike wê xwîn biherike.
- Pidî werimî ye, sor e û hesas e.
- Pidî û diran ji hev cuda ne.
- Di navbera diran û pidiyan de kêmgirtin (înfeksiyon) heye.
- Ji ber nexweşiya pidiyan diran wê bileqin û ji hev dûr bikevin.
- Di dema gezkirinê de wê zehmetî hebe. Wê cûtin pir zor be.
- Kesê ku protezê diran di devê wan de hebe ji ber nexweşiyê pir astengî wê bibînin.
- Dema nexweşiya gîngîvîtîsê û periodontîtîse di devê kesekî de hebe wê ji devê wî kesê bêhneke nexweş bê, mirov ji wan kesan dikerixin. Ji ber vê yekê jî dibe ku nexweşiya pidiyan qet daxuyanî nîşan nede û pêşve here. Hewce ye mirov her tim salê du car muayene bibe.

**Sedemên nexweşiyê çi ne?**

Dema xwarin û wexwarinê mirov bi kar tîne diran neyên firçekirin û dev neyê şûştin di hundirê devê mirov de li ser diranan tebeqa baqteriyan çêdibe. Hejmara wan baqteriyan û tebeqa wan çiqas zêde bibe nexweşî jî ew qas pêşve diçe û zêde dibe. Ev tebeqa baqteriyan neyê paqijkirin wê raçinkê dev û der û dora wî de belav bibe û nexweşî giran bibe. Diran bileqin û werin kaşkirin. Mirov bixwaze dikare pêşî li nexweşiya goştê diranan bigire. Her roj di pey xwarin û vexwarinê re diranê xwe firçe bike û devê xwe bişo wê devê mirov ji baqteriyan paqij bibe. Divê mirov navbera diranan jî bi benê diranan paqij bike.

Salê du car jî here cem doxtorê diranan muayene bibe.

Tedawiya pidiyan dema nexweşî dest pê dike pir rehet e. Qirêjiya ku li ser diranan çêdibe, ji vê qirêjiyê re dibêjin tebeqeya baqteriyan (baqterî plaxi) pêwîst e bê paqijkirin ji aliyê doxtor ve û hewce bike tedawiya dermanan jî dest pê bike. **AMED**

## Darşîlan



Darşîlan ji ber dewlemendiya vîtamînê dostê çavan in. Laş dişidîne. 100 gr darşîlan qasî sindoqek portakal e. Xwînê paqij dike. Kurmikên rûviyan paqij dike. Ji bo êşa mîdê baş e û her wiha êşa nexweşiya ba jî kêm dike. Ji bo tedawiya basorê jî gelek feydeyên wê hene.

## Ixlemûr




Kulîlka ixlemûrê ji bo gelek nexweşiyan derman e. Sîngê nerm dike. Ixlemûr wekî çayê tê bikaranîn. Laşê mirovan rehet dike. Ji bo ulserê jî baş e û gera xwînê bi rêk û pêk dike.

## Salep



Ji bo kuxik û bronşîtê bi feyde ye. Dema ku jin dikevin cilikan jî bê bikaranîn gelek bi feyde ye. Hêza hiş zêde dike.

## Tihtavik



Belgê wê wekî çayê tê bikaranîn. Ji bo gelek nexweşiyan derman e. Her wiha di xwarinan de jî tê bikaranîn. Hem teze û hem jî hişk tê bikaranîn.

## Dirînermk



Di belgên wê de asîtên organîk hene. Ji bo pidû, aloq û qirikê gelek bi feyde ye. Her wiha ji bo emel û basorê jî tê pêşniyarkirin.

## Beybûn



Beriya ku kulîkên beybûnê vebin tên berhevkirin û di bin siyê de tê hişkirin. Wekî çayê serê sibê beriya taştê qedehekê vexwin. Îştahê vedike. Êşa basorê kêm dike. Wekî madeya boyaxê jî tê bikaranîn. **AMED**

# Mifteya Kabê ya 800 salî dertê mazadê

Mifta Kabê ya 800 salî ku ji aliyê Xelîfeyê Ebbasiyan hatiye çêkirin, li Stenbolê dertê mazatê. Mifta Kabê di 13'ê vê mehê de li Stenbolê dertê mazatê û tê firotin. Li gora agahiyan ev Mifte di 1226'ê de ji aliyê Xelîfeyê Ebbasiyan hatiye çêkirin. Ne diyar e bê ev mifte ji aliyê kîjan hoste ve hatiye çêkirin lê tê zanîn ku ne yekta Mifte ye. **STENBOL**



# Fobiya mirinê û antîdepresan

Fobiya mirinê yek ji cureyên fobiyan e. Bi dehan cureyên fobiyê hene. Fobî di wê raman û baweriyê de ye ku ew dê bimire. Ji tevger û ceribandinên gorî wê bi xeter dûr disekine.

Bo mînak sporê nake wê ew cihekî xwe bişikîne an bimire. Cureyên fobiyan hin caran bi hev re girêdayî ne. Fobiyek dikare yeka din bitetikîne.

**Antîdepresan çi ye?**

Antîdepresan an dijî depresyonê ji derman, rêbaz, tedbîr û binavkirinên li dijî depresyonê ne re tê gotin.

Dermanên antîdepresan ji gelek grûban pêk tê û gorî rade û taybetiya depresyonê tê bikaranîn. Bo mînak MAOI, TCA, SSRI, SSRE hwd.

Her grûbek jî di nava xwe de li şaxan belav dibe. Dermanên antîdepresan mekanîzmaya neurolojîk ditetikînin an fonksiyonên wê qels dixînin. **AMED**

# Mala herî mezin a darîn li ber hilweşînê ye

Li Stenbolê li Girava Mezin mala herî mezin a darîn ku xwedî dîrokeke sed saliye, di demên berê de wekî Yetîmxaneya Rûm hatiye bikaranîn.

Her wiha di cîhanê de mala herî mezin a darîn jî tê zanîn û ji 5 qatî pêk tê. Mala darîn a dîrokî ji ber bêeleqebûnê niha bi hilweşînê re rû bi rû ye. Girava Mezin a Stenbolê di mehên havînê de ji aliyê gel ve eleqeyeke mezin dibîne. Ji bo betlanê cihê herî bêdeng û xweş e.

Faytonên ku li giravê ji bo gerê amade ne jî xweşikatiyeke cuda derdixe holê. Her wiha li vê giravê mala herî mezin a darîn jî cih digire. Ev dara dîrokî niha terkî qedera wê hatiye kirin. Hundirê xanî bi hilweşînê re rû bi rûye. Avahî ji ber bêeleqebûnê niha di bin rîskê de ye.

Mala darîn di sala 1898-99'an de ji aliyê şîrketeke fransiz ve hate înşakirin. Her wiha wê demê mîmarê navdar Alexndre Vallauryê projeya wê amade kiriye.

Niha hemû deriyên xanî hatine girtin. Mala darîn bi awayekî berbiçav xesareke mezin dîtiye. Deriyên hemû baxçeyên wê jî hatine girtin.

Der barê dîroka avahiyê de agahiyên gelek girîng hene. Jina bi navê Elenî Zarîfî ku bi eslê xwe rûm e di bin navê otela Prînkîpo Palast de avahiyê dikire.

Ev avahiya ku xwedî mîmariyeke bi bandor e li gorî pergaleke din hatiye înşakirin. Ji 5 qatî pêk tê. Ligel vê di hundirê mala darîn de saloneke mezin a şanoyê jî heye. **STENBOL (ANF)**

# Li Mîdyadê dibistana futbolê

Rêveberiya Galatasarayê bi serokatiya Adnan Polat tevlî 70 kesan ji bo merasîma vekirina Dibistana Futbolê ya Galatasarayê ya Mîdyadê çû Mêrdînê. Pêşwaziyeke bi heybet li bafirgeha Mêrdînê ji galatasarayiyan ve hate nîşandan.Galatasarayî piştre jî derbasî Midyadê bûn û bi merasîmeke heybet Dibistana Futbolê hate vekirin. Galatasarayî piştre jî çûn serdana cihên dîrokî. **MÊRDÎN**

# Li Hewlêrê hotêla pênc stêrk

Xeleka otêlên Tirkiyeyê Divan, li paytexta Herêma Kurdistanê Hewlêrê bi 60 milyon Euroyê otêlek pênc stêrk çêdike.

Li gorî nûçeya ku di malpera www.wp.irak.de ku ji hêla Wezareta Karên Derve ya Almanyayê ve, bo karsazên alman teşwîqî ramedaniya Iraqê bikin hatiye damezrandin de cih girtiye, Serokê Otêlên Divan Sarp Turanligil got, înşeata otêla pênc stêrk di 2011'ê de diqede. Turanligil got, li herêmê di warê otêlên navnetewî de valatiyek dîtine û ji ber vê otêlek bi vî awayî avakirine.

Di Otêla Divan a Hewlêrê de, ligel 146 odeyan 76 suitên taybet, du daîreyên qralan, 4 lobî û 6 salonên konferansê dê hebin. ***AKnews***



www.arsivakurdi.org